

Nameya Celîlê Celîl

Ji hemû mele û feqeyên dilsoz û dilovan re

Gelî Bira!

Demeke dirêj e li Îstenbolê Enstituya Kurdî hatiye avakirinê. Armanca vê enstituyê ew e ku bi giranî li ser dîrok, edebiyat, folklor, ziman û çanda Kurdî bisekine.

Edebiyata Kurdan a dewra berê zengîn e û rûbariya mîletê me ye. Navêni Elî Herîn,

Rûpel 15



Gelê Kurd naxwaze hêzên emperyalîst li Kurdistanê bi cih bibe û ji dewletê dagîrker re dibêje:


Destê xwe bikşînin ji welatê me

- Dewletê emperyalîst navê dagîrkeriyê kirine parastkerî. Metod û awayên dagîrkeriyê guhertine. Dema cihekî işgaldikin dibêjin "em diparêzin." bi van metodênuh gelê bindest dixapînîn.
- Bi navê hêza çalak "çevik güç" pêşî başûrê Kurdistan işgal kirin û gelê Kurd perîşan kirin. Vêga jî dixwazin bi eyînî awayî bakûrê Kurdistan işgal bikin û Kurden vir jî bi çol û çiya xin. Lê metodê emperyalizmê herçiqas nuh bin jî, gelê me jî ne yê berê ye, riya xwe baş nas dike, û bi saya partiya xwe, êdî nakeve xefikê emperyalizmê.

Di sazûmana cîhanê ya nuh de mijokdarê Amerîka di serî de li ser gelê Rojhilata Navîn, li ser hemû gelên cîhanê dixwaze hêzên xwe bide dameziandin. Di hêza cîhanê ya nuh de, pirsgirêka girîng bûyera Kurdan e. Amerîka di hêlekê de dixwaze ku Sedam têxe astengê û zeif bike, di hêla din de jî dixwaze ku Kurdan bi xwe re girêde, dîtin û ramana

emperyalîstê Amerîka ev e... Di sala 1991 an de ji zilm û kotekiye Sedam bê qedar Kurd derbasî Tirkîyê bûn, ey bûyera hanê pêsiya planan ji Amerîka re vekir, di bin navê parastina Kurdan de bi navê xwe yê resmî wezîfa hêzên hevgirtî (Birleşik görev kuvveti) bi navê xwe yê din jî hêza çalak (çevik güç) li ser axa Kurdistanê Rûpel 15

Dîwan
rênen par-
lamen-
toya
Kurdî-
tana
Başûr
bi ni-
vîsên
ingilizi
hatine
xemil
andin.
Kêfa
Seroka-
tiya
Kurdîn
Başûr ji
bindes-
tiyê re
tê. Hîna
ji destê
Sedam
xelas
nebûne,
xwe
davêjin
bin
perrê
emper-
yaliz-
mê.



Wêne:
Wela

Hikûmet li ber ci ye?

- Rêveberiya Taybetî wê cardin bê dirêjkirin, gelo wê ci biguhere? Me her celeb idarêwan dîtin, em di demênu ku rêveberiya Taybetî tune bû de jî jîyan, me demokrasiya(!) wan jî dît, belê tu car li ser me qetîam û qirkirinê wan kêm ne bûne.

Dirêjkirin an jî ji holê rakirina qanûna Rêveberiya Taybetî, li Rêveberiya Taybetî (olağanüstü hal) di van rojêن pêş de, jî nuh ve dê bikeve rojeva meclîsê û wê biryar bê girtin.

Weke tê zanîn, dewlet bi mehê de hikûmeta Rûpel 15

Karkerêñ dewletê birçî ne

- Hikûmetê, karberdana (greva) karkerêñ zireetê du meh li paş xist. Sendîka karkeran, ji bo îptalkirina qerara hikûmetê, daxwaznameyek dan Daniştayê. Hikûmetê, ewlebûn û rihețiya welêt kir mane. Lê rastîne ewlebûn û rihețiye. Hikûmetê ne xwest di mehê ci-nîna zad de karker dev ji kar berdin.

10 hezar û 600 karkerêñ zireetê du hikûmetê wê ev karberdan, etê, yên li 38 Çiftlikêñ Dewletê (bi tirkî: Tarım İşletmele-ri) dixebeitin, wê l'ê Hezîranê dest bi karberdanê (grevê) bikirana. Lê hikûmeta DYP-SHP, karberdana wan, du meh li paş xist. Li gora

Li zîndanan grevê birçîbûnê

Li zîndanê Silîva (Farqîn) û Elezîzê, girtî haziriya greva birçîbûnê dikin.

Dewlet tade û zilma li zîndanan roj bi roj zêdetir dike. Girtî jî li hember vê zilmê bêdeng namînin û ji her êrişen dewletê, bi livbaziyan cure cure xwe diparêzin û ji bo mafêñ xwe bi dest xin van livbaziyan xwe didomînin.

Li ser navê girtiyen zîndana Farqînê Cemal Bîngol di daxwiyanîya xwe de wiha dibêje: Rûpel 15

Cenazê Hafiz Akdemir li Licê definandin

Di ser kuştina rojnamevanê girtin. Ozgur Gundemê Hafiz Akdemir re li dora du hefteyan derbas dibe. Hê qatil nehatiye

Wek tê zanîn polisan bê ri-ze û daxwaza dê û bavê Hafiz ew xistibûn gorê. Rûpel 15

ROJEVA WELET

Kurdkujî 'pîknîka' Sezgîn û wezîfîn me

smet Sezgîn, Doxan Gureş û Unal Erkan ji bo sala wê bê hedefek danîne. "Sala wê bê wê Kurdistanê bikin cihê pîknîk û seyrangehê."

Pîknîk û seyrangeha sala wê bê perde û maskeya xwînreji û qetîamekê li pey hev e. Rûpel 15

REWS



Abdullah Keskin

Celal Telabanî

Celal Telabanî. Hûn vî navî baş dizanin û nasdikin. Ëdî ne li Kurdistanê, li Tirkîye jî herkes Celal Telabanî nasdike.

Heta berî bi du salan, tu kesî Celal Telabanî nasnedikir, ji xeynî Kurdan. Lî îro ji polisên sîkakê bigirin heta bi serokê MİT ê Teoman Koman herkes Telabanî nasdike.

Telabanî riya ne rê ji xwe re kire rê. Ew û Berzanî ev du sal in riya Tirkîye ji xwe re kirine rê. Pê li dilê mîlyonan mirovîn Kurd dîkin û derbasî Enqere dibin. Em neheqiyê li wan nekin car bi caran riya xwe bi Diyarbekirê ji dêxîn. Lî mixabin muxataben wan li Diyarbekir waliyê Rêveberiya Taybetî ye, mudurê emniyetê ye, yanê Kozakçoxlu ye, Erkan e... Ew mirovîn ku ji her deveren wan xwîn dibare, 'hevalbend' û 'alîkarê' Telabanî ew in.

Ev nexweşî û murdariya Celal ne nuh e. Sicîla wî ji vî alî ve ne paqîj e. Heçî Telabanî nasdikin vê nexweşîya wî ji baş dizanin. Berî bi du salan berê wî li Tehranê, piştâ wî

li Bexdayê bû. Wî çaxî jî muhatabê Celal ne Kurdên Iran bûn. Li wir jî bi Pasdar û ajanê SAWAME re rudinişt.

Telabanî demeke dirêj bi ordiya Iraqê re li dijî Berzanîya şer kir. Mîsyona cehşitîlyê baş bi kar anî. Nayê ji bîr kirin û dîrok dinivise. Wê hêjî binivîse.

Ne Telabanî, divê ew pêşmergeyên ku Celal xebat û xwîna wan pêşkeşî dagirkeran dike, ew keç û lawêñ-jin û pîrén ku bi bombeyêñ kîmyayê seqet mane û bi sedhezaran Kurdên ku di welatê xwe de sirgûn di-

Celal Telabanî ji muxabirê me re dibêje:
"Min rojnameya we dît. Hûn weşaneke PKK ê ne. Ji bo vê yekê ez hevpeyvînê qebûl nakim." İddiaya Telabanî em cidî nabînin. Rasîf û bîr û baweriyêñ me ci bin em wan dinivîsin. Heger ev were wê manê em ji wê jî narevin.

bin, li ber sînoran goristana çedîkin bifikirin: Heta niha vê politîkayê ci daye gelê me? Ji xwîn, hêstir û barûdê pêve ci da me? Berî bî du salan ji bo ci Tirkîye ji têkiliyan xwe dûr dixist, fîr çîma nêzîk dibe? Di vî babetî de lîstikeke gellekî mekrûh heye.

Telabanî heger nizane, bila bizane: Bakûr-başûr tu kes nikare Kurdan bike dij-

minê hevûdû. Ewê ku Celal têkoşîna wan a neteweyî weke "terorîzm" dibîne û pê li xwîna wan dike tê bi dagirkeran re rûdine, ji her dewletê û herkesî bêhtir dost in. Wextê ku bi sedhezaran Kurdê Başûr di welatê xwe de, li ber têlan bê nan û bê av rehîn diman û leşkerên Tirk her tişten wan talan dikir ji bo alîkariyê ki seferber bû? Politîkayê dewletan li gorî menfeeten wan dimeşin, tu kes divê piştâ xwe nedê dagirker û kolonyalîstan.

Celal Telabanî ji muxabirê me re dibêje:
"Min rojnameya we dît. Hûn weşaneke PKK ê ne. Ji bo vê yekê ez hevpeyvînê (roportaj) qebûl nakim."

Celal Telabanî mezîn dileyîze. Ji xwe her roj di TV û rojnameyên Tirkî de derdi keve. İsmail Beşikçi çapemeniya Tirkî weke liqekî MİT ê dibîne. Subjektif û spekulasyona rojnameyên Tirk her kes dizane. Prensîba me ev e: Em ne bêteref in. Rastî ci be, ji bo me mîzenek e. Heta niha bi gellek mirovîn ku em dîtinên wan çewt dibînin re me hevpeyvîn çêkir û weşand. Ji vî alî ve bila dilê herkesî rehet be.

İddiaya Telabanî em cidî nabînin. Rastî û bîr û baweriyêñ me ci bin em wan dinivîsin. Heger ev were wê manê em ji wê jî narevin.

NAMEYÊN XWENDEVANAN

NAMEYÊN XWENDEVANAN

NAMEYÊN XWENDEVANAN

Şehîdê welatê me

Şehîdê welatê me, Kurdan pîri in
Li erde jîyanê ne, qet namir in
Dîl zîmî û zoîr, serî rakirin
Jî bona jîyanê gellek bakirin.

Heta wan ji bo me gellek çekirin
Bi pîlîn ji xwînê, iehî rakirin
Sîpan û zînar û çîra fîrkirin
Hemî dane ber xwe bi xwe sorkirin.

Gemara heyama ji me rakirin
Bi xwîna xwe şûştin weki cîr kirin
Bi bîhna gula vê li ser wet kirin
Buhûta jîyanê gellek xweskirin

Xetir û tîrîj û rûmî geskirin
Dîl dosî li yara bi hev sa kirin
Welatê me Kurdan ji mer çekirin
Bi gelê cîhanê em dane naskirin

"Ji bo biratîna şehîdîn meha Gulân e"
Koma Karker / Gulân 1992 Libya

KARTA ABONETİYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara ... pê ve min bikin
aboneyê Rojnameya WELAT

Nav :

Paşnav :

Navnîşan :

Bedelê abonetiyê razînin:

Li Tirkîye : Y. Serhat Bucak İş Bankası Cağaloğlu
Şub. Hesap No: 379809

Li Derve : Y. Serhat Bucak İş Bankası Cağaloğlu
Şub. Döviz tevdiat hesap No: 3113617

Aboneyen héja,

Ji kerema xwe re vî cihî dagirin û tevlî kopyeke pelê
razandina bedelê abonetiyê bişînîn. Navnîşana

WELAT Nuruosmaniye Cad. Atay Apt.

No:5 Kat:1 D.4

Cağaloğlu / İSTANBUL

Tel: 511 57 60-511 66 02 Fax: 511 51 57

Mercen abonetiyê:

Li hundir	Li derive
6 meh	60.000
12 meh	120.000

Li hundir	Li derive
30 DM	60 DM

Kurdistan ci ye?

Gotina min a yekemîn silavê min ji hemû xebatkar û nivîskarên Welat re. Armanca min ez ji rojnameya hemû Kurdan re tiştekî kin bînîvîsim. Hêviya min ew e Welat her tim derkeve û roj bi roj xwendevanên wê zêde bibin.

Pîrik min hebû. Rojekê ez li dersê xwe dixebeitim ew ji hat li ba min rûnîst. Demekê ma, aciz bû û got:

-Lawkê min, ezê ji te tiştekî bipirsim. Min jî got:

-Ser çavê min pîrê. Ka bêje derdê te ci ye?

Pîrî min a ji dînyayê bêxeber:

-Lawkê min, Kurdistan ci ye? Ewqas însan dibîjin, "bijî Kurdistan, bijî Kurdistan." Di ser de jî ewqas xort û ciwan xwe ji bo wî tişti didine kuştin.

De ka ezê ji pîra xwe re bibêjim ci? Tişte di dilê min de, Kurdistanâ di dilê min de min rabû ji pîra xwe re got:

-Pîrê Kurdistan qîzek e. Qîzek wiye, tu qîz wek wê ne hatiye dinê. Tu kes wek wê xweşik nabe. Porê wê dirêj dirêj wek Dicle û Feratê ne, lê pozê panya piyê wê dikevin. Çavîn şîn û zelal li ser in mîna Behra Wanê ye. Lî rûckê wê; rûckê wê jî

mîna çiyayê Araratê sipî boz e. Kincê wê libasî wê tim kesk e mîna zozanê Qerecadax û deşta İxdîre ye. Lî dilê wê qîzê tim bi kul e, tim bi derd e, tim bi xwîn e. Wek xwîna wan ciwanan ku sedan tênu kuştin, wek xwîna ku bi benê qırka Şêx Seidî kal de hat. Wek xwîna ku li Heleple hat rijandin.

Ji ber wî hawî ev qîz bi tu kesî re hîna ne zewicîye. Îcar aneka li vî warî binavê A. Ocalan û hînekên wek wî hezaran heta bi mîlyonan lawê wan ji bo ku wê qîzê dîlxweş bikin, kul û xemê wê ji dilê wê derxîn û ji bo pê re bizewicin, derin li hemberî neyârîn wê yên ku bi çavê xerab lê dînerin re ser dikin û tênu kuştin. Heya niha neyârîn wê qîzê nehatine qelihandin. Ji ber wî hawî ev qîz jî bi tu kesî re nezewicîye. Kurdistan ev qîz e, pîrê.

Pîşti van gotinê min pîra min keserek mezin li xwe xist û wiha got:

-Ax!.. Ax!.. lawkê min, bila ez niha wek te ciwanik bûma bê min çawa ew neyârîn dipelixand û ez diçûm bi wê qîzê re dizewicîm.

Soreş

Çinar / Amed

Nameyek ji biçûkekî

Ji bo bîranîna şehîdan, HEVKOM (Hevgirtina Malbaten Şehîd û Girityen Kurdistan) şevek amade kir. Her sal di van şevan de mirovîn niştimanperwer besdâr dibin û baweriyâ xwe bi têkoşîna neteweyî xwirt dikin. Gelek malbaten şehîdan jî, besdârê seva Hannoverê bûn. Yek ji Memo yê biçûk bû. Memo pişti ve digere mala xwe, nivîsandîneki bi kar tîne û ji HEVKOM re dişine. Nama Memo yê biçûk wiha ye:

Ji berpîrsiyarên HEVKOM re, Şeva bîranîna şehîdan min pîr eciband. Min Newroz jî eciband.

Bî bangî "Şehîd namirin, bî Serok Apo" min got. Min şano (tiyat-ro) tevi temâş kir. Min bi Rojîn re (10) diya wê guhdarî kir û li çepka xist. Min tîfi leşkerên faşîst kir. (Demî Şano)

Min wêneyen sehnê gellek eci-

bandin.

1-Kemal Pir (li zindana Diyarbekirê şehîd ketiye)

2-Mazlum

3-Eğit

4-Enver

5-Zekiye

6-Cindo (M.Balçın, bavê Rizan û yê Eli ye)

7-Kurdo (Eli Balçın)

8-Hilmi (Birayê Mustafa yê li Kasselê xwendevan e. Şiklê wî li mala me heye)

9-Haki Karer

10-Vedat Aydin (Ez çûbûme meşa bîranîna wî li bajarâ Kolin)

Min ji kasetê jî seyrkiriye)

11-Hayı Durmuş

12-Hüseyin Durmuş

Nama Memo bi vî hawî diçede.

Lê rîsmê ala ERNK jî ji bî nekiriye û bi destxetê xwe ew şandkiye.

Amadekar: Ehmed Xelîli

Di kurdî de du tîpên bêdeng

Kurdî zimanekî mî (tewabar), nerm û vekirî ye. Li gor gramerâ C. Bedirxan ji def çend fîtsnayan, du tîpên bêdeng nahêne ba hevdû. Anglo du tîpên bêdeng wek "bb", "mm", "ll", "ss" û hwd. nayêne ba hevdû. Ev yek ji bo ew bêjeyen ku di zimanê biyans de, bi du tîpan têni nivîsandin jî derbas dibe. Mirov dema wan bêjeyen biyans bi kurdi binivîsine, divê bi tîpek binivîsine.

Mînak:

Milî, mele, wele, gerfla...

Lê, di kurdi de çend bêje hene, ku du wateyên (mîneyen) wan hene. Di van salen dawî de, hînek nivîskar ji bo ku wateyên wan bêjeyen diyar û cuda bibin, hînekan bi du tîpên bêdeng dînivîsîn.

Mînak:

Pir: Pirde, köprü

Pîrr: Gelek, zehf, çok

Ker: Eşek

Kerr: Sağır

Lê, di kurdi de hînek dînivîsîn, ku bi sidîf an bi xwîrtî derdi kevin. Ew dînivîsîn wiha bi du tîpa nayêne nivîsandin. Ev jî di kurdi de prensîbeke wê heye, ku ew dînivîsîn wiha bi du tîpa "r" dikeve navbera "i" û "î" yê ne. Wê demê dînivîsîn wiha bi du tîpa "r" dikeve navbera "i" û "î" yê ne. Wê demê dînivîsîn wiha bi du tîpa "r" yan nanivîsîne.

Mînak:

Birîn, kirîn, zirîn, şîrî û hwd.

Dîsa li gor prensîben gramerâ Celadet Bedirxan, ew bêjeyen (kelimeyen) ku da-wîya wan bi tîpên "d" û "t" diçedin û dema ew pasdaniya pêşhevân û berhevân (ji bo herduyan jî pasdani -tir- e) digirin, "d" û "t" dikevin. Bi tenê pasdaniya -tir- pê ve tê nivîsandin.

Cend mînak:

Ji bo pêşhevâkî (komperatif): Bilind+tir= bilintir, dewlemend+tir= dewlementir, xurt+tir= xurtir, kurt+tir= kurtir...

Ji bo berhevân (superlatif): Bilind+tir= bilintir, dewlemend+tir= dewlementir, xurt+tir= xurtir, kurt+tir= kurtir...

Civîn: Toplantı

Çapemenî: (basın)

Çekdarî: Bi çek, bi sîlah

Çewtî: Xelet (yanlış)

Çewtî: Xeletî

Dilgermî: Heyecan

Ferbûn: Hînbûn (öğrenmek)

Hîndekarî: Talim (eğitim)

Kelepor: (birikim)

Lebat: (eylem)

Lebatkar: (eylemci)

Lebatkarî: (eylemcilik)

Rawestîn: Sekinîn (durmak)

Rê lê girtin: Nehîstîn (önlemek)

Rojnamegerî: Rojnamevanî

Bi Kurdekkî Başûrê Kurdistan re hevpeyvîn

'Telabanî û Berzanî temsîlciyên kî ne?'

● Em pêşmergên ku li Tirkîyê ne, herdu rêxistinan jî bi tûjayî rexne dikin, me fêhm nekr bê ev temsîlciyên kî ne? Em li vê derê reben û perîşan bin, bê kes û bê xwendî bin, di înceetan de bixebeitin, ew jî li kîfa xwe bimeyzînin.

Kekê Rêbuwar, hûn ji kengê ve ji warê xwe dûr ketine?

-Di sala 1991 an de ez û sê heval ji Hewlêr di mîrga sor re em derbasî Tirkîyê bûn.

We ji bo çi dev ji warê xwe berda?

-Bi hezaran mirovên weke min ji zilma Sedam, warê bav û kalê xwe terk kirin, di malbatâ min de xwişk, bira, dayik û bavê min hebûn dayik û bavê min di sala 1988-89 an de di zîndanê de bi koteke qetil kirin, xwişka min cû mîr vê gavê ez nizanim bê li ku dîjî, birayê min ê mezîn di şoreşê de şehîd bû, goristana wî iro li Silêmaniyê ye.

Hûn li ku derê Kurdistanâ Başûr radiwestîn?

-Em li gundê Kerkûk, Xalobazîyanî yê radiwestîn. Di sala 1987 an de caşen Sedam gundê me tar û mar kirin, bi bombe tev hilweşandin, gundê me hezar û pênc sed xane hebû, panzdeh hezar mirov lê dijiya, dev ji mirovan berde, artêşa Sedam kevirek li ser hev nehişt, çiqas bax û baxçê gund û zeviyê gund ku hebûn, bi qirêder û dozera xira kirin, gundê me iro bûye erdek rût.

Hûn qet hatine girtin?

-Belê, ez ji sala 1989 an heyanî 1991'ê di zîndanê de raketim.

Bona çi hûn hatin girtin?

-Sedemê girtina min ji ber ku ez li hemberî rejîma Sedam keti-

me rêxistinê, ez hatime kifş kîrin, berî ku ez têkevime destê hikûmeta Sedam di sala 1987 an de ez derketime Tirkîyê, bi telefonê ez bi mamê xwe re axivîm, mamê min got: Dayik û bavê te hatine girtin, ku tu ney wê wan bikujin, ji bo vê yekê ez sala 1989 an de ji Tirkîyê derbasî Kurdistana Başûr bûm, hê di tixûb de leşkerê Sedam çavê min girêdan, destê min kirin kelepçê, paşê ez xistim îşkencê, di îşkencê de ez şilfi tazî kirim, ez niha fihît dikim ku laşê xwe nîşanî te bidim, birînê bedena min hê jî rehet nebûne, pişî ez ji zîndanê derketim min ji mamê xwe sehkîr ku bav û dayika min jî qetil kirine, pişî serbestbûna min ez car din derketime Tirkîyê.

Ev mirov, malbat û pêşmergên weke we sedemê çi ji warê bav û kalê xwe koç dibin, serokê partiyen we qey li we nabine xwedî?

-Parî heke partî bûya, serokê me heke serok bûya, wê bi rêxistin bîr û bawerî bûna, wê li me xwedî derketina, lewma em tim mihacir, reben û stuxwar in.

Li Tirkîyê we li kîjan baregeh (kamp) ê cih girtibû?

-Min li baregeha Qangal ê nûçeya Sêwasê cih standibû.

Di baregeha Qangal ê de

çend pêşmerge hebûn?

-Em nêzî 15000 pêşmerge bûn.

Di baregehê de jin û zarok jî hebûn?

-Belê, malbatê ku karibûn, yê ku ji ber zilma Sedam xilasbûn zarok û jinê xwe jî revandibûn.

Ji bo xwedîkirina we û tedârikê we kî ji we re alîkarî kir?

-Ji Ewrûpayê alîkarî ji me re dihat, belê dewleta Tirkân ev alîkarî tev nedida me, bi qûtekî nemirî di navbera têlê li hev baydayî de em dijîn, heke ev jiyan be, ez tro li Enqerê bê kar û xebat dijîm. Ez çûme ling temsîlciyê neteweyen hevgirtî ji min re wiha gotin: "Pêşmergên ku ji sala 1988 an heyanî 1990 an hatine em ince alîkariya wan bîkin, ê ku di 91 û 92 an de hatine em alîkariya wan nikarin bikin.

Xwestinê we ji xelkê Tirk û Kurd weke çi hene?

-Min anî ziman kekê min, bê rewşa me çawa ye, xwestinê me ji xelkê Tirk û Kurd ku guh bide ser kul û derdê me, bibe alîkarê me rebenî û bêkesiya me, zilm û kotekeya li ser serê me li cihanê belav bike, pirsgirêkê me hal bike.

Xwestin û gotinê we ji temsîlciyê KDP û YNK weke çi hene?

-Em pêşmergên ku li Tirkîyê ne herdu rêxistina jî bi tûjayî rexne dikin, me fêhm nekr bê ev temsîlciyên kî ne? Em li vê derê reben û perîşan bin, bê kes û bê xwedî bin, di înceetan de bixebeitin, ew jî li kîfa xwe bimeyzînin.

**Hevpeyvîn:
Ş. Arjen**

Bera xayin û xwînxwaran nehişt ku Hafiz bibe mêvanê me


Ev qederê mehekê em li hêviya kekê Hafiz bûn, gellek caran û berya heftakê jî bi telefonê em bi hev re axivîn, kekê Hafiz wêbihata weqfa mafê mirovan ji bo ku tedawî bibe, lewra di girtigehê de, di koçkîrîn û îşkencê de gellek lêdan xwaribû, wê ji bo vê yekê bîhata Enqerê ku kul û birînê xwe rehet û derman bike, lê bera xayin û qeles nehişt ku kekê Hafiz bibe mêvanê me. Hafiz wiha digot: "Keko, bila rojnama Ozgur Gundem derê, ezê paşê werim dîtinâ we û dest bi tedawiya xwe bikim, çavê gelê me tev li vê rojname rojname ye, eger ev rojname derê, emê pişta rojname û nivîskarê burjûwazî bidine erdê û bîşkînîn, lewra gelê me ji van rojnameyên burjûwazî ne têr dibe û ne jî serwext dibe, lewra nûçeyek bi rastî nadîn, tev hatine firotanê, lewma ez dibêm barekî giran û wezîfeke mezin li ser milê me dikeve." Kekê Hafiz digot: Ku ez hatime ba we, ezê behsa girtigehê û Kurdistanê ji we re bikim hûn û jî behsa kar û xebata xwe bikin paşê jî hûn rind li Enqerê min bigerînin, ka bînerin bê kar û xebata

me dijwar e an ya we. Dawiya gogina kekê Hafiz ev bû: Hûn jî ji xwe re diben em rojnamevan in, ê ku gurçik wî ne pola be û ne bi bîr û bawer be li Kurdistanê nikare rojnamevaniyê bike. Ji bo gelê xwe em serê xwe tu carî danaynîn, natîrsin, çiqas asteng û kelem li devê rîça me hebe, emê bidin alî û hilweşîn, qet em pişte danaynîn.

Belê! Bera qeles û xayin nehişt ku kekê Hafiz bibe mêvanê me, lê bila xayin û qeles wisa zanîbin, hemû mirovân bî rûmet û xwedî bawerî wê di rîç û doza kekê Hafiz de bimeşin.


Em dibêjin bi sond û peyman tu tirs û xuşûş nakeve dilê me, bi kîf û esq, bi dil û can emê jî bibin mîvanê te kekê Hafiz. Emê bihêlin ku qeles, xayin, bêbext û xwefiroş, ji bîr û bawerîya me, ji hêrs û heybeta me, ji rastî û maftîya me, ji yekîtî û tifaqîya me, xweliyê bi serê xwe dakin, bi çol û çiya kevin, dîn û har bibin, wê goristana xwe bikolin, wê goştê xwe bixwin, wê bedena xwe perçê bikin weke hirç û berazan...

Şaristan Arjen



KONEVANIYA NUH

Parlamenterê Batmanê Nîzametin Toğuc



Li ser hilbijartinê

W eke têzanîn me hilbijartinek meheli di 7'ê Hezîranê de derbaskir. Pişti vê hilbijartinê ji gellek hêlan ve deng têne guhê me û gellek pirs jî di serîyan de dihêlin. Weke van pirsan ji me têne kirin:

1- HEP çîma nekete hilbijartinê?

2- Namzed (berendam)ê ku HEP ê li pêş xistin çîma serfiraz nebûn?

3- Gelo HEP bi mirovê serbixwe têketa hilbijartinê wê serfiraz bûbuya an na

5- Konevaniya ku hikûmeta koalisyonê dimeşîne gelê Kurd çawa lê dinere?

Ezê bersivîn van pirsan li gora dîtin û ramanê xwe bînime zi-man.

Pirsâ yekemîn: Ev e, HEP nikarîbû têketa hilbijartinê, lewra 6 meh di ser kongreya HEP ê re derbas nebûbû, ji bo vê yekê HEP nekete hilbijartinê û nikarîbû bi partiyek din re jî, hevalbendiye bîkira, hevalbendiye ku mebûsên HEP ê bi hikûmeta koalisyonê re kir poşmaniya wê derkete holê, hinek mebûs hê jî xwe ji nava dest û lepênen wan xilas nekirine, ya li destê karbdestê HEP ê ma, ku însiyatiya xwe bidin idara meheli. Gellek ji wan kesan li gora mafê xwe yê şexsî qerar standin... mafê şexsî di ser matên gelî re girtin.

Ya duyemîn: Gel ji HEP ê sar nebûye, gel ji HEP ê gellek hez dike, ez bawer im heke HEP bi serê xwe biketa hilbijartinê, weke hilbijartina mebûsan, wê HEP li bajarê Kurdistanê tevan serfiraz bûbuya.

Ya sêyemîn: Gelê Kurd ji hikûmet qoalisyonê tu car hez nekiyîne û hez nake jî, bila hikûmet pesnê xwe nede dibê ez li Kurdistanê di hilbijartinê de serfiraz bûme, bila nebê Kurd zilm û kotekeya min diecibîn, na... ne rast e bi qasî qırşikekî tu baweriya gelê Kurd bi hikûmetê nayê û nehatîye, jê re ne çare ye lewra kul û bîrînê gelê Kurd zehf kûrtir kirine, xwîna ku dewletê di Newrozê de rijandiye hêjî zuwa nebûye... lê ez ci bikim destê bin kevir e... di-be ku car carna mirov ji yarê dayka xwe re dibê bavo...

Ya çara ev bû: Çiqas heyanî kengê wê werine xapandin?

Ya pêncâ ev bû: Gelê Kurd kesê ku ji xwe re ji bo mebûstiyê namzed rîdan, di wextê de istîfa nekirin û dereng ketin, hinekan ji wan jî istîfa nekirin.

Ya şesa: Ji bo hilbijartinê namzedên me dereng man tu propaganda û xebatek rind rî nedan, bi kurtayî sedemên ne karkirina

JİYANA WÎ

Hafiz sala 1965 an li gundê Sîsê (yolçatu) Navçeya Lîce ji dayika xwe bûye, malbatâ Hafiz 6 kes bûn, 4 xwişk û 2 bira, birayê Hafiz û mezin hê 12 salî winda bû. Heyanî iro hê nehatîye dîtin, bavê Hafiz çûye rehmetê, Hafiz û dayika xwe bi tenê li Diyarbekirê dijîyan, bi qetikirîna Hafiz iro dayika wî bi tenê maye.

Kekê Hafiz sala 1984 an ji doza (dawa) KUK ê hate girtin, bi têkoşina endamê PKK ên gitigehê û bi têkoşina serhildana 15'ê Tebaxê, kekê Hafiz dil da têkoşina Kurdistan. Kekê Hafiz li gellek gitigehan hate gerandin, di navbêra çar dîwaran de ji bo ku li ser doz û xebata gelê Kurd bê deng nedima, ji gitigeha Amed koçî Eskişêhir, Aydin ê bû, di sala 1991 ê de ji gitigeha Aydin ê texliye bû, çawa texliye bû li Amed bû rojnamevanê Yeni Ulke. Kekê Hafiz, li ser doz û mafê gelê Kurd, li ser zilm û kotekeya dewletê di hêla rojnamevaniyê de, sembla rasî û ronahiyê bû kelemê ber çavê xayin û qeleşan bû, lewma destê xwe yê bi gemar di xwî-

"Sedamgate" û "Demirelgate"

Memo Nazê

Rojnameya "Newyork Times" belgeyek bi dest xwe xistiye, ku George Bush, berya dagîr-kirina Kûwêtê bi deh mehan bi Sedam re peyman çêkiriye. Li gora hin rojnameyên dinyayê, armanca Amerika ew bû ku, Sedam bide bawerkirin ku hêza wî ya leşkerî xwirt e û têrê dike Kûwêtê bistîne. Bi gotineke dinê Amerika ji bo dagîrkirina Kûwêtê rî li ber Sedam vekir, dawî ji bo ketina xwe ya navçê ji xwe re sebebek çê bike.

Li gor hin rojnameyên dinê ne tenê ev peyman bi Sedam re hatibûn kirin. Amerika û Sedam ji bo hinek tiştên din jî bi hev re soz dabûn. Yek jî; pişti ku Sedam Kûwêtê bistîne, wê melikê Urdunê bibe melikê Erebiya Siûdî û Urdun ji bibe bike.

Serokê Enternasyonala Sosyalîst û pirsa Kurdan

Serokê nuh yê Enternasyonal Sosyalîst Fransî ye. Navê wî Piere Mauro ye. Mauro zemanevê serokwezîrê Fransa bû û niha jî reisê belediya bajare Lille e.

Ev demek e bûye mode kîjan serokê Ewrûpa bê Tirkîye gotina wî ya ewil ev e: "Ez li hemberê dewleteke Kurdi me. Mafê Çarenûs ji bo herkesi di be belê ji bo Kurdan tenê nabe û û din..."

Mauro ji berî bi çend rojan li Tirkîye ev gotin du car kirin: "Ez ne terefdarê dewleteke Kurdi me. Ez ne terefdar im ku her milet xwedî dewlet be. Ez li hemberê dewleteke Kurdi me. Ez li hemberê terorê me. Lî cardî jî heqê Kurdan heye. Heqê wan yê kulturî û ziman heye."

Ji mehîn Newrozê û vir de bûye mode û bûye adet heçî ji Ewrûpa tê van gotinê jorî dibêje.

dewleteke Filistinî!

Di nêzîk de wê "Demirelgate" jî eşkere bibe. Bi daxwaza Amerika, leşkerêne dewleta Tirk balefirân radike ser qampê PKK'ê; bi daxwaza Amerika balefirân dewleta Tirk radibine ser Derya İcê (Ege), ji bo Yew-nanîyan bitîrsîne, ji ber ku Yewnanîstan, di mesela Yûgoslavya de li diji Amerika radibe; bi daxwaza Amerika dewleta Tirk xwe amade dike ku leşker bişne Yûgoslavya; bi daxwaza Amerika, Demirel diçê bi Borîs Yeltsin re peyman mor dike, û hwd...

Buhayê vê bazara Demirelgate'ê wê ci be? Amerika bi dewleta Tirk re peyman çêkiriye ku pirsa Kurdi ji holê rakin. Lî bi şertê ku dewleta Tirk ji Amerika re nêçîrvaniye bike.

GOTİN

Yaşar Kaya



Şehîdê Gundemê Hafiz Akdemir

Ji Îstenbolê heta Diyarbekirê em bi otomobilê çûn, çare tune bû, di tu teyarê de cih tune bû, dema Hecê (Hicazê) bû herkes diçû Hecê. Be şeva tarî re em gihiştin Diyarbekirê. Me civatek mezin çêkir, sibê dê me cenazê şehîdê xwe çawa rakiya. Dewletê cenazê şehîdê me revandibû û veşartibû. Wan dixwest mîna cenazê. Welat Aydin bikin û dîsa ji me 10-15 kesan bikin. Lî belê vê carê me keys neda wan. Em bi hevalên Diyarbekirê re şêwirîn, me qewlê xwe kire yek, ku emê ji bo cenazê şehîdê xwe tu mitîngan çenekin û fersendê

nedîne wan.

Ew hevalên ku em ji Îstenbolê çûbûn, serê sibehê em çûn cem Waliyê Kurdistanê Unal Erkan, me jê re got.: "Cenaze revandin çare nîne, hûn ji şehîdên me jî ditîrsin, hûn hem dikujin hem jî direvînin û vedîşîrin. Polis û Tîmîn we li qatîlê Hafiz nagerin, lê tabûte wî direvînin." Berya nîvro me ji çapemeniyê re daxwiyaniek amade kir, me ji dinê re gellek gotin ûlan kir. Pişti nîvro ji civata me çû cem diya Hafiz serxweşiyê. Dayîka Hafiz nedigiriya, lôrîken mirinê ji çavêñ wê nedihatîn, yek gotinek bi tenê digot: "Kurê min şehîdê Kurdistanê ye." Bê kîn xeber dida, ji kesî re neyartî nedikir, tiştekî wisa nedigot, zehf metîn û li pê bû. Em ji malê derketin. Dotira rojê me dayîka Hafiz û xwişka wî hilda em çûn ser mezelê Hafiz, me jê re gul û sosin biribûn, me meqbera wî xemiland. Ez bi tirkî û bi kurdî çend gotin axivîm, min xweliya (axa) wî maç kir û me sond xwar "heya em hebin tû û mîna van sûrîn li dora Amedê

hebî, tu di bin axê de nînî, tu di dilê me de yi.

Em ji ser mezelê Hafiz hatin Ozgur Gundemê, hevalan fotografek Hafiz li pişt masa wî daleqandibûn, bi gulan xemilan-dibûn. Dayîka Şefiqe hat li ber rismê Hafiz rûnişt. Heval di derheqê jiyanâ wî de axi-vîn, paşê em giş bi hev re çûn mala dayîka Şefiqe, me serxweşî teze kir.

Dotira rojê cejn (eyd) bû. Li kuçeyên Diyarbekira xopan, zarakan çek û solen eydê li xwe kiribûn, digeriyan, dileyiştin. Tava Diyarbekirê erdê dikeland. Germa deşte hebû. Belengazî bêkesi, li kuçeyên Diyarbekirê digeriya. Te digo qey ev qedera me ye, em nikarin jê xelasbin.

Ji xeynî dema cenazar emê kengê û çawa herin Diyarbekira xopan.

Berê êvarê em bi hevalan re ber bi otela xwe ve daketin, kurekî delal bi deng û bi meqam gazî dikir: "Ava sar, ava cemidî."

Lî belê min nihîri êdî tebat û taqeta min tuneye, min ji hevalan destûr xwest, ez ber bi mizgetta mezin ve cûm.

PKK xelko, xelkê mayme

Wusxan Cêmal

Belçika de suka Bruksel de 21.5.92 de ji Şiyene kerde, mi na siyena mîleta mawo Kirmancu ju şiyene peda kerde, verva zulme u zorda-riya dewleti Tirk ji ku mîlete Kirmanc tevera verva dost u Dismen ju biyena xo bimis-no mîlete sare dîna, vere parlamente Belçika de kora raye, verva Parlamente A.T. şime, Şiyene de boncas (50) hazar Kirmanc ameyvî, tu vatene tevetniyo welatê kirmancyo sayeke, raye ra eve Almankî Ingilîzkî, Françkî, Hollandkî, Tirkî u Kirmancî dirûmey vat, "PKK xelko xelki mayme, Seroke ma wes vo, Selam Apo'y re ha-zar selam, Welate Kirmancî Faşistune Tirk re beno mezele." Eze ameyme vere Parlemento ye A.T. ju Baqanê Ingilîzî, ju Baqane Rumi, ju Baqane Belçika qeseykerd, na hire Baqan u Komitewa Şiyenera ki di Haval kotra zumin şî Parlemento A.T. Mesela Kirmancu u PKK cemaat kenê, Kirmanc vere Parlementoye A.T. de niş ro, nem saete ura tepiya şime caye topbiyene, saet u nem ra tepiya, Heyet peyser ame, seroke Parlemento qeseykerd seveta Kirmancu newe querare viren sero name hure, horte baqanu ra dest teney sone welate Kirmancu xelke Kirmenc de qeseykene mare rapor ane, Deva sima deva de Haq'a diha awe şere, haqaxo bizere, sima ki je ma bine bandirera veciye,



manc zere A.T. de kene sa-yé, çike deste vere ame ke-ne.

Ma kirmancî rind bizanîme ke mîlete mara qeri kes haqa ma eve can u roo nikeno saye deva mara mara qeri

kes wayir nevejino, Serilhil-danu ave beme hira keme qeweta xo ju keme, xelesiya ma nejdiya, endi waht amo bine bandira sar ra vejime, hukmate xo peda keme.

Protestoya Îranê

Hikûmeta Îranê berî bi çend rojan hikûmeta Tirkîye protesto kir. Trênen xwe hew dişmin Tirkîye. Seferên nav Tehran û Enqere hatin îptal kirin.

Mesûlekî balyozxaneya Îranê li Enqere heftiya derbas bû, me-qamîn Tirkîye xeberdar kir: "Em ji iro pê de seferên nav Tehran û Enqere disekinînin. Emniyeta rîwiyyen me tune. Hikûmeta Tirkîye nikare xeta hesin biparêze. Hin kes ketin pêşîya trênen û lê reşandin. Zarokek me hate kuştin û 8 kes birîndar bûn. Me ji bo vê pîrsê ji me-qamîn lazim garantî xwest. Belê heta niha me çû cewab ne girt. Heta em bersivekê negrin û hikûmet çûn û hatina rîwiyyen me saxlem neke em vê xetê ve-nakin."

Herwiha niwênerê balyozxanê Amînî "ji hikûmeta Tirkîye tezminata kuştî û birîndaran dixwaze."

Dewlet û hêzên nexwiya

"Mesela Kartal Demirax meseleyeke cidî ye û mirov difikirîne." Kartal Demirax mirovekî tarî û qatil e. Berî salê 80 an bi MİT ê û kontr-gerîla re kar kiriye. Sala 1987 an di kongreya Partiya ANAP ê de demaçê li ser Ozal danî. Hate girtin û pişti çar salan ji hepsê derket. Tiştekî ecêb e û kes bawer nake.

Mesela Demirax roja duşemê pişti programa M. Alî Bîrand careke din bû gotin. Girêdayê programê M. Alî Bîrand vê dibêje Mahmûd Alinak: "Ji axaftina Kartal Demirax dixwiye ku Reis Cumhûr û serokwezîr jî li Tirkîye ne di emniyetê de ne."

Alinak daxwaznameyek da serokê meclîse û ji meclîse dixwaze li ser pirsa Kartal Demirax bisekine. "Divê Meclîs tehqîqatê bike û vê meselê cidî bigre. Kî elemanen kontr-gerîla dighîne. Pişti programê Bîrand bala xelkê kişand ser emniyetê û ordiyê. Gelo ev hêza tarî û ne xwiya ku Ozal behsa wê dike ne ew hêz be ku xelk jê re dibêje kontr-gerîla? Li pey suikasta Ozal kî hene, ci-ma meqamên mesûl li vê pirsê nakolin? Dewlet ketiye destê hêzên tarî? Wa diyar e li Tirkîye serokwezîr û serokcumhûr jî di nav de herkes di nav tehlûke de ye."

'Kê 13 kes kuştin?'

Mebûsê Partiya Refahê Zekî Ergezen nameyek da Wezîrê hundir. Di nameya xwe de Zekî li ser kuştina 13 kesan disekine. "Ev kes kî kuştine gerek derkeve." Herwîha serokê Partiya Refahê û endamên serokayetiya vê partiyê li hin bajarê Kurdistanê dan xwiyakirin ku dewletê ev tiş xistiye stuwê PKK, ev ne rast e, mesele divê baş bê tehqîqkirin.

Hikûmet hejmara polisan zêde dike

Serokatiya polîs heta meha Temmûzê dê 5564 wezîfedar û polîsîn din bigre. Hikûmeta Demirel û Înonu zorê daye polisan, tîman û elemanen ku karê ewlekariyê dikin.

Hikûmet gav bi gav dike hikûmeteke polîsî û bê alîkariya polîs û tîman hikûmet nikare xelkê kontrol bike.

Ji kîfan re kirî polîs bifirin

Rojê derbas bû Wezîrê Hundir İsmet Sezgîn li 16 bajarê Kurdistanê geriya û cihê çûyê mizgînî da polisan: "Xizmeta mecbûrî jî 3 salan daket 2 salan. Kesê du salê xwe dagirtine wê tayin bibe." Kêfa polisan ji vê xeberê re gellekî hat û tiş nema bû ku bifirin. Ji ber ku "ji cehe nemê xelas dibin." Polîsî salê xwe qedandine wê li Tirkîye 3 cîhan bixwaze. Ji van sê cîhan wê yek jê re derkeve. Ev xelata wan û xizmeta wan e.

Komela rojnamevanê sînornasnekir

Rojnamevanê Fransî yê sînornasnekir serên xwe bi dînyayê re dêşînîn. Li ku azadiya çapemenî û weşandinê heye û tuneye taqîb dikin. Vê komelê li ser Tirkîye lêkolînek çêkirîye. Lêkolîn ji serê sala 1992 an heta bi 25'ê Gulanê digre. Li gora lêkolîn û rapora wan li Tirkîye heta vê tarîxê 4 rojnamevan hatine kuştin û 6 jî di zîndanan de ne.

Lêkolîna rojnamevanan dibêje: "Ji Çilê 1992 an vir de tişten bûne giş di eleyhê hikûmetê de ne û hikûmetê súcdar dikin. Heta niha 55 bûyerên li dijê azadiya rojnamevantiyê bûne. Gellek kovar û rojname di bin zordariyê de ne û kovarê mîna 'Yeni Ülke' û '2000'e Doğru' heta niha bi dehan car hatine kom kîrin.

Xelk ji SHP istîfa dike

Berî bi çend rojan li Altindaxê 600 kesî bi hev re ji SHP'ê istîfa kîrin.

Sebebê istîfakirinê xerakirina mal û xaniyênen xelkêne. Zabitên belediya Altindaxê bi ereba û buldozeran û bi qewetek mezin ji polîs û zabitan girtin ser malen xelkê û xaniyênen wan xerakirin.

Li ser vê yekê di nav xelkê 'gecekonduyan' û zabitên belediyê de şerekî mezin derket. Di vî şerî de birîndar çêbûn û gelek kes hatin girtin. Eynî rojê xelkê vê taxê bi hev re ji SHP'ê angô ji partiya lawê Înonu istîfa kîrin. Hejmara kesen istîfa kirine 600 kes in.

Belediya Altindaxê li Enqere ye.

Dewleta sansûr û qedexeyan

● Pêşketina kulturî û fikri li Tirkîye rawestiyaye, xwendin û kitêb peydekirin êdî ji herkesî nayê. Bûne tiştekî luks. Li welatekî wilo jî dê çawa fikir bi pêşkeve, mirov dê çawa bibin xwedî zanebûn û pêzanîneke rast.



Wê zincirên kitêban kengî bîşkîn

Demirel û Înonu gellek soz dabûn. Di nav van sozan de fi-rehkirina demokrasiyê û rakirina qedexeyen li ser fikir û kitêban jî hebûn. Heft meh derbas dibin qedexe di cihê xwe de ne û demokrasî hê jî tengtirbûye. Ji berê zêdetir kitêb û kovar û rojname têne komkirin.

Li ser esasê madeya 8 an 13 kitêb qedexe kirine û 17 kovar jî girtine.

Kitêbên hatine komkirin:

1- Kitêbên İsmail Beşikçi
2- Kitêba Mehmed Bayrak "Kürt Halk Türküleri"

3- Mirzali Çimen "Dünü ve bugünü ile Geri Kalmışlık Sorusunu"

4- Metin Çiyayi "Sonsuzluk Ülkesinden Masallar"

5- Bülent Habora "Bodur Başkanın Öteki Dünya Anıları"

Giş qedexe li gora madeya 8/2 têne meşandin.

Tirkîye welatê qedexeyan e. Tenê de 40 salê dawî de 7850 kitêb, nivîsandin, filim û kaset hatine qedexekirin û berbend kîrin. Salêna paş 80 an serê sansur û qedexekirinê bi carekî re filitiye. Qanûnên nuh, serrastkirin û lêzedekirinên qanûnî rekorê sansurê şikenandine.

Salâna pey 80 an ji dema Ebîdilhemîd jî derbas kîrin. 39

ton kitêbên civandî hatine şewitandin û li dora 100 ton weşan û kitêb jî hatine îmhakirin û ji muh ve kirine kaxet.

Xwediyên kitêban bi hezaran sal ceza xwarin e. Bi sedan nivîskar, rojnamevan, hunermend ketine ber aşê işkencê û di zîndanan de emrê xwe bihûrandine. Bi tenê mesûlên kovarên siyasî û nivîskarên wan zêdeyî 5 hezar sal ceza xwarine.

Sala 1984 an Mehkemên Dewletê yê Ewlekariyê çêbûn. Van mehkeman tişten li Almanya ince bûne kîrin.

Li gora hesabekî sala 1945 an serê xwendevanekî profesyonel 10,2 kitêb diketin. Pişti 5 salan ev bûye 5,3.

Salâna dawî nêzîkî 100 weşanxane ji piyasê rabûn.

60 weşanxane dev ji weşandina berdan. 500 kitêbfîros di salê 80 an de dikanen xwe girtin, an jî guhertin kîrin dikanen qirtasiye.

Pêşketina kulturî û fikri li Tirkîye rawestiyaye û xwendin û kitêb pêdekirin êdî ji herkesî nayê. Bûne tiştekî luks. Li

welatekî wilo jî dê çawa fikir bi pêşkeve, mirov dê çawa bibin xwedî zanebûn û pêzanîneke rast.

HEP di derheqê Hurriyetê de dawe vekir

(ENQERE-WELAT)

Rojnameya Hurriyet 15'ê Hezîranê di nivîsandinek xwe de ev nûcê weşandibû: "zimanê PKK ê vedibe (PKK'nin dili çözültüyör)". Ev nûcêya haftê li ser devê mirovekî girtî hatibû ziman: "Çûna min a bargehê (kamp) nava PKK Serokê HEP ê bajarê Aydinê rêberî kîrin" li

ser vê bûyerê ebûqatê HEP ê Faik Candan daxwîyanîkî kîrin: Li gora saloxdariya ku me ji Serokê HEP ê, ê bajarê Aydinê stand tu têkiliyê wisa nehatîye girêdan, HEP heyânî fro tu mirov neşandine bargehê PKK ê, qet Mebûsê HEP ê li

barghê PKK ê nebûne mîvan, lewra fro HEP bê mebûs e, lewma ez dibêm rojnameya Hurriyetê di derheqê HEP ê de nûcêyek bê esil weşandiye. Her wekî rojnameya Hurriyet û

Komkirina Gundemê

Rojnameya Ozgur Gundemê ku ev nêzîkî du hefte ye derdi keve, di hejmara xwe ya 10. de hate komkirin. Ozgur Gundem ji hejmara xwe ya yeke-min ve bala dewletê kişandiye ser xwe ji ber ku rastiyê dîni-visîne û pîsîtyê dewletê derdix meydanê. Ji bo ku Ozgur Gundem bitirse û nûcêyên xwe li gora dilê dewletê çêke hîna derneketibû dihat tehdîtkirin. Gellek muhabîrên wê, bi taybetî yê li Kurdistanê bi telefonan dihatin tehdîtkirin. Hêja di ser derketina Ozgur Gundem re 10 roj derbas-nebûbû, rojnamevanekî wê ji aliye dewletê ve hate kuştin, pişti du rojén din jî hejmara 10. a Ozgur Gundemê hate kom kîrin.

Sebeba dakomkirin jî reportaja bi serokê gelê Kurd Abdullah Ocalan re bû.

Ji aliye kî ve hikûmeta koalisyonê realîteya Kurdî nas dike, ji aliye din ve jî ji ber reportaja serokê gelê Kurd rojnameya Ozgur Gundemê dide civandin.

Komkirina 32 yan

Rojnameya hefteyî Yeni Ulke hate komkirin. Hejmara Yeni Ulke ya dawî bi bîrîvara (qera-ra) DGM ya İstenbolê ji nivîseke li ser serok sawciyê DGM ya Enqere Nusret Demiral hate komkirin. Berpirsiyârê Yeni Ulke komkirina rojnameyê protesto kîrin.

Kitêbê Beşikçi

Li Çolemêrgê yek pirtûkxaneyek tenê heye, lê xwiya ye dewlet wê jî ji bo Çolemêrgiyan zêde dibîne, ji ber vê yekê nahêle xwediyê pirtûkxanê Xalit Yalçın bi hîsanî pirtûkan bifiroşe.

Berî du rojan polisan girt ser vê pirtûkxanê û dest danîn ser pirtûkeke Mamoste İsmail Beşikçi "Dîtin û raman li ser PKK", kovarên "Yurt sever Gençlik" û "Ozgur Halk". Li ser vê yekê xwediyê pirtûkxanê Xalit Yalçın mura-cale dâdestêniya (savcılık) Çolemêrgê kîr, ji ber ku bê bîrîvara komkirinê polisan pirtûk û kovar komkiribûn.

Nûcêgihanê 'Mucadele' Polis bela xwe ji rojnameyan û kovarên pêşverû venake. Yan wan digirin, yan weşanen wan didin hev, yan jî bi awayekî wan tehdît dikin. Bi vî awayî jî dixwazin wan bitirsîn.

Roja 17'ê Hezîranê Nûcêgihanê (muhabîrê) kovara Mucadele, Gulay Demiroz ji aliye hêzên dewletê ve hate girtin.

Berpirsiyârê kovarê li ser girtina vê nûcêgihanê lêkolînek çêdikin, bes polis di derheqê girtina wê de tiştekî nabêjin. Gulay Demiroz nûnerê kovarê ya Izmit bû.

Xelasey ma pabestey serkewtişê gerîlla ya!...

J. Espan

Dîna di girwey û hedîsey girdî ki heme milletan ser o tesîr kenî, tim û tim nêqemnî. Ge ge girweyê ki yew serî mîyan di benî, seserri di nêbenî. Seserra ki ma tede yî hetey hedîsan ra gelek pêt û xurt a. Ewro kê vexto ki xwi ra pey ewniyêni, kê sêni na seserri mîyan di çend serranê muhîman tesbît bikî. Ya zî kê sêni çend periyodanê serekân veynî. Nê periyodî kamderi yî?

Kê sêni vajî periyodê yewin, Cengê Dînyawo Verên o. Dîna bi nê cengî ser û bin bî. Qorê dewletî werte re arney hewenayış û tay dewletê newey awan bî. Heta bînî ra Rusya di yew sistemdo newe peyda bi.

Kurdan nê bedeliyayışê (vuriyayışê) Dîna ra fayde nedî. Wa fayde weyra mano, welatê ma peyniyey cengê Dîna di newerna parçê bi. Çunkî ma zey millet wâyîre yew programê xelesiyayışê nêbî. Ma xwi organize nêkerdi. Cemâtê ma girewîte û lete-lete bi. Cora ma nîşay nê feresetî ra istifade bikî.

Periyodê diyin, bi Cengê Dînyawo Diyin dest pey kerd. Xerîta Dîna hewna bedeliya. Dîna bî wâyîre di sistemanê politikan. Tayn hêzanê newan sahnedê politika di cay xwi girewt. Ma Kurdan se kerd? Ma hewna wayfîre yew programdê xelsiyayışî nêbî û ma bi organize nêbî. Aqubeta Cumhuriyeti Mahabatî ma pêrû zanî. Çaxo ki no periyod qediya halê ma hina xirab bi. Çunkî hînî yew bawer nêkerdinî ki Dîna di sînorî rayna bedeliyêni. Vatey îstîkrarî dekewtbi fekdî şarî. Herkesî îstîkr-



Gerilla rî wayfîrey kerdiş, paytey gerillay girewtiş yew wezîfedo millî yo.

rar ra behs kerdînî. Îstîkraro ki dîna rî rîndbi, ma rî mardiş û kolemendiş bi. Çunkî îstîkrar pawitoxê statûkoy bi. Kirrey qali, semedo ki ma xurt nêbî, ma bi organize nêbî, ordi û çekê ma çinê bi, destê ma pistindê ma di mendî, ma temaşey şarî kerd. 40-50 serî zî ebi inhewa bille sebeb viyartî. Periyodê hîrin ebi vilabıyayışê Dewleta Sovyet dest pey kerd û hemâra zî dewam keno. Gorbaçov bi simbolê periyodê hîrin. Zeke yeno zanayış rojo ki Sovyet villa biya heyansî ewro, nîzdî 20 dewletê newey awan bî. Sînorî ki şarî vatînî nêbedeliyêni lete-lete bî. Nîka heme Dîna di mesela milletan munaqeşê sera. Dewlet biyayîş ya zî azad û xwiserbiyayış bîney zî pabestey nê konjukture sîyasiyê Dîna wo. Dîna di ewro semedî welaftî û milleti hepîs rakewtiş, ş-

wey peyda bî. Labelê, konjuktur heme çî niyo. Ma Cengê Dîna ey Yewin û Diyin di dî, dîna pêrû têmîyan kewto labelê ma nîşay bindi tira istifade veynî. Ay çax saffbiyayışê persa Kurdan tenya pabestey konjuktur niyo. Xelasey Kurdan, verê verêkan Kurdan ra besta ya.

Ewro çaxo ki ma weziyetê Kurdan, periyodê yewin û diyin reyra muqayese bikî, eşkera aseno ki ma gelek hetan ra aver şîyî. Ma hetandê şîyasi, eşkerî û roşanbirî ra zaf menzîl girewto. Ewro ma zanî ma ci wazanî. Programê mayo polîtîk eşkera wo. Rayir û metodê xelasbiyayış zelal o. Kurdi tarîxdê xwi di çirray ehendey yew nêbî. Welatperwrey Kurdan mîyan di mirdey xwi vila biya. Kurdistanê ser o şehîd kewtiş, semedî welaftî û milleti hepîs rakewtiş, ş-


kence veynayış bîyo yew şeref. Hisse millî xurt û qilew bî. Kê sêni vacî, ewro Kurdi heme hetan ra bî wayîre yew karekterdê millî. Zaf eşkere aseno ki cengê PKK'ê cemâtê Kurdan hetey milletperwrey ra idêna wo. Cemâtê Kurdan ewro herwext ra vêşer xwi bawer keno. Gerilla hêvî û qewet dano şarî.

Coka ganî (gerek) ma heme Kurdi zaf rînd bizanî: Xelasey şardê ma heme hetan ra pabestey serkewtişê gerilla ya. Ewro kam behsê politika millî bîko, ganî bîzano ki, gerilla pawitoxê menfe'etanê Kurdistaniyo millî yo. Gerilla rî wayfîrey kerdiş, paytey gerillay girewtiş yew wezîfedo millî yo. Beytardê Dewleley Tîrkan û gerilla di bê terefey nêbena. Na mesela di ganî verê hemînî Medaya Kurdan, roşanbirî û zanay "Wa biciwîyo gerilla!"

Kurdan dîqet bikî. Roşanbirê Kurdan nîşno vajo, cengê PKK'ê û ey Dewleta Tîrkan mi alaqeder nêkeno. Rojname û kovarê Kurdan nîşnî va jî ez ne destey Dewleti û ne zî destey PKK'ê gêno. Hercî ganî her roşanbirê Kurdan ki xwi ra vano welatperwer, cengê dewlet û ey PKK di eşkera ver a Dewleley Tîrkan bo. Ver a Dewleley Tîrkan bo û paytey gerillay bîko. Çunkî ver a cemâtî, mesuliyetê roşanbirî ey cîteran, şonan, dewijan, karkeran û kategoriyandê bînan ra vêşer o. Ma hemînî eşnawito vanî, roşanbirî wîjdanê cemâtî yo. Vanî, roşanbirî, cîm û goşê cemâtî yo. Eki roşanbirê Kurdan biwazo bibo wîjdanê cemâtê Kurdan, ganî wezîfeyo xwi ewro biyaro ca. Çunkî cengo ki ewro PKK kena cengê milletâ Kurd o. Cengê azadî û serbestey o. Cengê PKK'ê ver a zulum û zordareya hînzar serran o. Peyniya nê cengê di şarî ma azad beno. Kurdistan bindê potnînandê neyaran ra xelesan.

Peynî di ez wazena vajo, ma ganî çîrray xwi virf nêkerî. Dewleti bi qewet, bi çek û sîleh virazenâ. Dewleti zor reyra awan bâna. Eki Cengê Yewin û Diyin di Kurdan xwi rînd organize bikerdiñî weziyetê ma ewro yewna hewa bîni. Labelê ma heze millet ewro hîna bi organize û xurt i. Konjukturê Dîna zî ewro heme wext ra vêşer musaft o. Eki ma nêwazenî nê periyodê hîrin di rayna lejê xelasey Kurdistanê vinî ki, eki ma nêwazenî çend serî ra pey bidî çokandê xwi ro û vajî "vey gidî, gîllî ma birîş, la mi senê ona kerd"; ay çax ganî herkes gore bê hêz û zanayışê xwi paştî bido lejê xelaseyda Kurdistanê, ganî vajo:

"Wa biciwîyo gerilla!"



SÛRA AMEDÊ KEVIR BÎ KEVIR HİLDİWEŞE

Eserên dîrokî, mîna sûra Amedê li cîhanê kêm in. Sûra Amedê di cîhanê de pişî sed'a Çînê, bi dirêjahî û bi heybeta xwe ya duyemîn e. Ev esera tarîxî her roj hinek jê dikeve, kevirek jê tê xwarê. Kes lê xwedî dernakeve û ji

xwe ev pirr li hesabê dewletê tê. Dewlet ne hevalê avakîrinê, belê ê xerakîrinê ye li Kurdistanê. Li Hesenkêfê binerin, bê dewlet çîqas bê hesasiyet û li dijî ilmî ye. Ji bo Hesenkêfê heta niha gellek protesto û name ji hikûmetê re çûne, belê giş bê netîce mane. Ji bo sûra Amadê jî tu hikûmet tu tişt nekirine nakin jî.

Gerillayê Jin

'Şêr şêr e; ci jin e, ci mêt e'

Gelo li welatên din jî, di dema şoreşan de jin weke li Kurdistanê wiha bi hejmarek zêde û bi egidiyek xwirt tevlî şoreşê bûne? Bi rastî girîng e mirov vê pirşê herdem ji xwe pirs ke.

Iro dema em li şerê gerilla û li serhildanê gel dinerin em dibînî ku jinê Kurd cihêñ xwe bi xwirtayî tê de digrin. Di nava refen gerillan de mirov dikare bêje ku ji sê behran behrek jê jin in. Bi kêmâyî her taximek gerilla ji çar mangeyan ava dibe û ji van her çar mangeyan yek jê jin in. Yanî sê mange xort in û yek jin in. Her mangeyek ji heft kesan an neh kesan ava dibe. Li gor vê, bîstûyek an bîstûheft xort û heft an neh kes ji jin di gîhîn hev û dibe taximek gerilla. Her çiqas li gor rîzbûna nîzama ARGK'ê girîng e taximek ji sê mangeyan avabibe ji di pratikê de ev wek ku me li jor da xwiyakirin dibe çar mange, ji ber ku her gav û saetê zêdebûn çedîbe. Lê ji hejmara jinan bêhtir ez dibêm ya tewra girîng û baş jiyana jinan di nava gerillan de ye, ku mirov bikaribe bîne ser ziman.

JİN Ü JİYANA KEVİN

Jinê Kurd xwediyê gelek xisûsiyetê hêja ne. Eger ku di nava civaka kevin de ne kole bûna, helbet wê ev xisûsiyeta wan baş bikar bihatana û wê fîdeyek mezin bigandana civakê. Lê ji ber ku hêşîrên dijmin û mêtîn xwe bûn ew xisûsiyetê wan yên baş bi ber avê re diçûn.

Ku em bînin ber çavêñ xwe emê bibînin ku jin di malê de ji sibehê heyâ adînî sibehê kar dikir û li hember hemû heqaretan ji dengê xwe dermedixist. Di kar û xebatê de fedekariyek xwirt dikir. Qet nedibetîlî û ji îmkanan kêm xebatek zêde derdi-xist. Lê wek me got, ji ber ku hêşîr bû ti qiymeta wê û karê wê tunebû.

Jinê Kurd dema ku hatin na-va refen gerilla jiyanek nuh dîtin. Ev jiyana jiyanek bi rûmet bû û jiyanek bi hurmet û hezkirin bû. Dîtin ku gerillayê xort qiy- metek pîr mezîn didin wana û ev cara yekemîn e di civakê de dibîn xwediyê mafen jînîtî û mi- rovatiyê. Di nav refen gerilla de, ci bi ziman û ci bi xwendinê hînî gîlek tîstan bûn. Li ser civaka xwe, diroka xwe û şerê xwe perwerdekarî (egitim) ditin. Pişte xwe nas kirin. Hûn dizanîn ku mirov xwe nas neke. ci jin ci mêt bi kîrî tîstekî nay û herdem kîleyê xelkê ye. Lê mirov xwe nas bike nexweşîya xwe ji dinase û dermanê wê ji bi re-hefî kare bibine.

Iro di nav refen gerillayen de mêt xwediyê ci mafan bin, jin jî xwediyê wan mafan in. Lê hinek kes karin li vê rewşa iro bine- rin û bêjîn qey wiha bi hêsanî gi- hîstîn van mafen di nava şo- reşê de. Lê bi rastî ne wiha ye. Heta ku jin gi- hîstîn mafen iro, hem partiyê û hem jî jî- nan gel- lek şer li hember fîkren ci- vaka ke- vin kirin.

Heta ku jin gihiştin mafen îro, hem partiyê û hem jî jînan gelekkar hember fîkren civaka kevin kirin. Bi rastî di vê hîlê de jinê Kurd tu caran nikarin deynê Partiyê û Serokatiya Partiyê û şehîdan bidin. Em dikarin bêjîn Serokatiya Partiyê bi nêzîkbûna xwe ya rast û bi li sersekinandina xwe ya hergav ji bo azadbûna jinan gelekkar hember fîkren civaka kevin kirin.

JINAN XWE ÇAWA DAN QEBÜLKIRİN?

Em dizanîn ku tu Kurdan serdayî bîhîlî, bê wê ci bînin ser serê jinan. Hinek kesen ku fîkra Partiyê baş nas nekiribûn jî dixwestin ku di nava refen gerillayen de bi çavekî biçûk li jinan binerin û wan ji şer dûr bixin. Partiyê li hember van kesen kevneperest gellek şer kir. Bi mehan û salan li ser wan sekînî heta ku ew kes ji vê kevneperestiyê dûr xistin û gihiştin fîkrek ronahî.

Lê em dikarin bêjîn di vî warî de tewra muhîm diket ser milê jinan. Ku jinê Kurd xwe di nava şoreşê de îspat nekiribûna dibû ku ew xebata Partiyê jî ya di vê hîlê de bi ber avê re biçûya. Ji ber vê yekê, girîng bû ku jin li hember xortan xwe îspat bikin, ku ew jî weke zilaman karin barê ser milê xwe rakin.

Jinê Kurd ji bo îspatkirina vê rahiştin çekan, birçî man, tî man, bi rojan di zinar û kevandeyan de meşîyan, di bin baran û berfî de gav paş de neavêtin... belkî bi wan zor û zehmet dihat, lê disa jî ji bo xwe bi hevalen xwe bidin qebûlkirin zor didan xwe û xwe li paş wan nedîhiştin. Heta mirov kare bêje ku caran ji zilaman bêtir xwe didan kar û xebatê ku xwe bidin qebûlkirin.

Ew fîkra civaka kevin ku di-gotin "Jin namûs e", di nava şo- reşê de ji di dema derbasbûyi de gelek zehmetî derxist pêşîya jinan. Dema ku jin dihatin bibin gerilla hinek kesan digotin, "Ev hatine ci? Wê li serê me bibin bela." û gundiyan dema ku gerillayen jin didîtin dilen xwe bi wan dişewitandin û digotin: "Lawo herin li mala xwe rûnê, hûn jin in, hûn namûs in, ku hûn têkevin nav destê dijmin wê tiştîn xerab bi we bikin..."

Li hember van kevneperestiyen girîng bû, jinan xwe bida îspatkirin. Ji bo vê jî girîng bû xwe zane bikin. Li serê çiyan, destek danîn ser çeka xwe û destek ji avêtin pirtûkan û bi şev û roj xwendin ku rîk û fîkra Partiyê baş nasbikin ku karibin li hember wan ser bikin û wan jî bi xwe re zane bikin. Li çiya di civînîn gerillayen de û li gun-dan di civatîn gundiyan de herdem axaftin, ku jin ne namûs e, lê namûs xaka welat e. Û bi gundiyan dan qebûlkirin ku bi rastî ne jina li serê çiyê li esas ji-



na li malê hêşîrê dijmin e û dijmin kare pê bileyize. Lê divibû ku gundî vê bi çavê xwe bibînin.

Dema ku gerillayen qîz li serê çiyan şehîd ketin û dijmin textor bir ser wan û dîtin ku bi salan li serê çiyan û di nava xor-tan de hîn qîz mane, gundiyan nuh fêhm kir ku jin karin di şo-reşê de cihê xwe bigrin û bi tenê serê xwe ji malê derkevin, li serê çiyan bimîn. Û li ser vê yekê baweriya xwe; wan jî bi jinan anî û mil dan wan, qiyet dan wan.

Gerillayen ku digotin wê jin li serê me bibin bela ji dema dîtin ku di ser de jinê Kurd li hember dijmin bi egidî şer dikin û fişenga dawî berî canê xwe di-din û xwe bi saxî naxîn nava lepê dijmin, baweriya wan rûnişt ku jin jî weke wan mîrxas û qehreman in û tu ferq de nav-bera wan de tuneye. Wê demê ji bo wê fîkra xwe ya şaş li ber xwe ketin û hîn bêtir qiyet dan jinan. Dema ku zêde qiyet dan jinan, jin ji ser xwe neçûn û hîn bêtir bi kar û xebat li vê qiyet-dayinê xwedî derketin. Vê jî kir ku di navbera zilam û jinan de

hezkirinek bi hurmetkarî çêbibe û her du alîfakiyek xwirt ji hev re bikin û hevdû temam bikin.

WEKHEVIYA JİN Ü MÊR, WEKHEVIYA CIVAKÊ YE

Iro di nava şoreşê de mirov dikare bêje ji bo wekheviya jin û mîrân bîngehek gelekî saxlem û dirûst bi xwîna şehîdan û keda Partiyê hate avêtin û em bawer in li ser vî bîngehî wê jiyanek gelekî xwes û azad bidome. Û em dikarin bêjîn ku di nava gerillayen de ci karê heye jin û mêt iro bi hev re dikin û kes ji kesi aciz nabe. Heta car caran taximîn gerilla ku mangeyek jinan di nava wan de tunebe, pêşneyarî gerargehî dikin ku hevalen jin tevlî wan bikin ku xebata wan xwirtir bibe. Ji ber ku gelek kar hene jin hîn bêtir bi fedakarî û qehremanî dikin.

Iro di refen gerillayen de ji girtina zêrevaniyê (nobetê) bigire heta çêkirina xwarinê, pehtina nan, xebata nav gundiyan, şerê li hember dijmin û parastina Partiyê, di hemû karan de jin û mêt bi hev re xebatê dikin.

Iro jin diaxivin, civînan

çedîkin, tevgerê çedîkin, dixwînîn, digerin, welatê xwe û gelê xwe dinasin û diparêzin û li ser mafê xwe û mafê mirovatiyê bi dil û can û bi dayîna xwîn û can disekekin. Wek ku me got heta ku jinê Kurd gihiştin vê rojê gelek ked û xebat kirin û şehîd dan. Ji bo vê yekê girîng e ci xort, ci jin (û bi pirrayî jî jin) qiyeta vê roja gihiştî baş zanibin, li van mafen gihiştî baş xwedî derkevin wan biparêzin û firehtir û xwirtir bikin ku dilen şehîdan şad bimîne û keda Partiyê cihê xwe baş bigre.

Bi rastî Partiyê ji jinê Kurd re jiyanek serbilind û bi rûmet ava kir. Xwedîderketina vê jiyane incax bi xwedîderketina partiyê tê parastin û domandin. Em bawer in ku jinê Kurd çawa bi şerê li hember hemû kevneperestiyen û zor û zehmetiyen gihiştin vê rojê, ji iro pê ve ji wê wiha bi rûmet xwe pê de bidin û di nava refen gerillayen de ev jiyana azad û wekhev ku ava bûye, wê bibe jiyana tevahiyê gelê me di welatek serbixwe azad û wekhev de.

Servan

Ji destpêka damezrandina xwe ta ûro grûbêñ çep yên Kurd sonda têkoşinê bi her awayî, ji bo serfiraziya Kurdistan xwarine, hê jî dixwin. Di nivîs û gotinêñ xwe de propaganda dîkin, ku ew bi gelê Kurd re ne, di têkoşîna wî de ne, pê re ber bi serfirazî, azadiyê ve dimeşin û wê bimeşin. Li Kurdistanê têkoşin ji aliye kê dibe bila bibe, piştgirî dîkin û pê re ne.

Lê bi rastî ne pê re ne. Ev nivîs û gotin ya rastî gellek xweş in. Mixabin jiyan şanî me dide, ku ev tenê û herwiha nivîs û gotin dimînin. Ji dev û rûpelan nakevin jiyanê.

Dilê her Kurdê niştîmanperwer bi welatê wî re ye. Her Kurd, ku têkoşerê gele xwe be, hêja ye. Lê ev hêjabûn girêdayê şert e, girêdayê kar e. Ne tenê dilxwestin û dilniyazî, divê çalakî jî hebe. Çalakî ji xwestina dil ne kêmtrir be.

Mirov nikare ji aliye kî bi salan xwe bi gotinêñ vala, bê çalakî bixapîne, ji aliye din jî dilpak û welatparêz bimîne. Divê hin berdelêñ dilpakî û niştîmanperwer hebin. Ev jî têr nakin, ger mirov bixwaze xwe Kurdekkî dilniyaz bibîne, pêwist e mirov hişyar be, mafe gelê xwe bizanibe, biha û rûmeten gelê xwe biparêze.

Tê zanîn, ku li bakûrê Kurdistan, bi salan e, şerekî dîjwar heye. Ev şer di bin serokatiya PKK, bi ala ERNK û bi gerîllayêñ ARGK pêş ve dije. Di salân dawî de ev şer bi serhildanêñ gel gav bi gav yekîtiya gelê Kurd pêk tîne, ber bi azadî û serxwebûna Kurdistan ve dije. Serhildan, mîna ji aliyeñ hin kesan tê şâ-

'Çepê Kurd' ci dike?

A. D İ K İ L İ

nîdan wisa bi xwe dest pê nekir. Serhildan bê xwedî jî nîne. Herkes zané: Bi xwîna gerîllayêñ ARGK, şehîdîn me yêñ leheng pêk hatiye. Serhildan rihekî gelek bilind û ıradeyeke ji pola daye gelê Kurd. Her Kurd bi van serhildan serbilind dibe. Ji bo yekîtiya neteweya Kurd riyekê gelek fireh û berçav vebûye. Ev yekîti jî, wê di salên pêş de pêk bê. Kurd wê meclîsa xwe ya neteweyî hilbijîren. ARGK dîbe arteşike bi serê xwe. Serhildan wê hê fireh û mezintir pêş ve biçin.

Ev bûyeren xweş û pîroz ji hemû Kurdan re ye, ne ji bo hin Kurdan e. Ji ber vê yekî jî divê hemû Kurd pê re bin, tê de bin, li anegora karînê xwe wê cihekî bigrin û bimeşin.

DÜRKETİNA Jİ GEL

Em dibînin li gel hemû van bûyeren jî, hê grûbêñ çepen "Kurd" xwe tev nadîn. Gavek pêş navêjin. Roj bi roj hê jî gotinê 15-20 salf ku tim dikirin, ducar dîkin. Çiqas biçük dîbin ewqas jî, ji bermama gelê xwe, ji pirsa neteweya xwe dûr dikevin. Gotinê tûj dikin. An jî xwe pîr milayim şanî didin. Ji aliye kî serhildan a gelê Kurd iştîmar dîkin. Li ser xwîna şehîdan

serê xwe bilind dîkin, lê bixwe jî, ji dagirkereñ Tirk zedetir gerîlla înkar dîkin. Dixwazîn xwe pîr şarîstanî (sîvîl), aşîfxwaz şanî bidin, ji ber vê jî, heta ji wan bê, xwe ji Tevgeriya Rizgariya Neteweya Kurdistan dûr dîkin wişa jî ji gel û daxwazîn gel dûr dikevin.

Di nav vê rewşê de Kurdekkî ku xwe welatparêz bibînc û hê jî bikeve pey grûbêñ wilo, divê serê xwe bixe ber xwe û baş bifikire, ka di wî de kîmasyek heye ya na! Ka ew, bi rastî ci dixwaze? Kurdistan dixwaze ya grûba xwe dixwaze? Bi gelê xwe re ye, ya bi çend "heval" ên xwe re ye? Mîna ku soz dabin hevdû û fedî dîkin ji hev biqetin! Ji aliye din, fedî dîkin bikevin nav Kurdan jî. Belavok û kovarê xwe jî, ji şerma bi dizî belav dîkin. Pîr caran xwedî li tiştîn xwe jî dernamevin. Ji gavêñ ber bi gel dibezin, xwe paş ve didin, direvin. Gelo ev rewş, rewşa kolefi nîne? Cîma mirov xwe ji bo xatîrîn çend kesen bê xîret ji gelê xwe dûr bixîne? Cîma mirov ji xwe ewqas bireve? Cîma nikaribe destê xwe bavêje pêşîra grûba xwe ya bê xîret û hesab jê bipirse? Reva ji têkoşîn, ev dûrketina ji gel ji welat, cîma bîbe karê Kurdekkî niştîmanperwer? Cîma mirov vê rev û

xwe de helandin e. Azadî û serxwebûna me, şexsiyetbûna me, bi ya neteweya Kurd ve girêdayîye. Wekfî din ne ramen serfiraz ne jî şexsiyeta giştî ne mumkun e.

Yekîtiya neteweya Kurd bi idolojiyê hîç û pûc nayê cih. Yekîtiya netewe, yekîtiyeke idolojîk jî nîne. Ev yekîti ber bi armansa serxwebûna Kurdistan meşîn e. Di vê meşê de cihê her Kurdê durust û welatparêz heye. Her Kurd divê xwe di vê meşê de bibîne. Dervayê vê meşê ketin ji gel û welat dûrketin e. Ger em li hîviya yekîtiya "grûb û partîyan" bimîn, emê jiyan xwe vala derbaskin. Ji ber ku wê ev pêk neyê. Pêwist jî nîne. Pêwistî yekîtiya gel e, yekîtiya netew e: Ev jî pêk tê. Her Kurd ci ji destê wî tê, divê ber bi vê yekîtiye bîne.

Gundorkevirêñ aşê genim dihîrin, ard (arvan) çêdibe. Genim hemû em Kurd kes bi kes in, ard gel e, netew e. Kurdekkî bixwaze genim (kes) bimîne, nikare di vê yekîtiye de cih bigire. Pêwist e, em hemû xwe di nav çerxîn aşê de bihîrin, bikin ard, bibin yet. Ev Kurdbûn e, xilasbûn e, serxwebûn e.

Emê bi vî awayî bigihîjîn bilindiya neteweyen cîhanê, di nav wan de cihê xwe yê bi rûmet bigirin.

YEKİTİYA NETEWEYİ

Dijmin bi xapandina salan me ji şexsiyeta me dûr xistiye. Vêga li Kurdistanê şexsiyeta Kurd ji nuh ve ava dibe. Divê, em şexsiyeta xwe ya ji dijmin azad, nexin bin koletiya çend kesen ku bi xwe jî ji şexsiyeta bindestan xilas nebûne! Divê em mirov e bi serê xwe bin. Bi serêxwebûn frada xwe di nav frada gelê

XÂÇEPİRS

Amadekar: Rasto Zilani

	1	2	3	4	5	6	7	8	9	10	11	12
Çeperast:	1-Pêwende											
	kirin, gihan-											
	din. 2-Navê	2										
	mehekî/ Ser-											
	ma, seqem/	3										
	Dawe, dax-											
	waz 3-Cihê	4										
	ku otobus û											
	trên ji bo bi	5										
	rêketinê lê											
	diskinin/	6										
	Ap, birayê											
	bav/ Nota-	7										
	yek 4-Bi											
	erebî hûr û	8										
	rûdî/ Ji yekî	9										
	10											



sil bûn an xeyidandin 5-Orte, nav/ Pêşnavê şervanekî ji Dilükê (Entab), berya damezrandina PKK'ê di 18 Gulân 1977 an de şehîd ket, di wêne tê ditin 6-Navê rojekî/ Ne temam hinek 7-Ronahî, ziya/ Notayek. 8-Li Ewrûpa navê payitextekî/ Çelav an hafize, zanîn 9-Xupakî, bêhnpak (bi erebî) 10-Çiyayek li welatê me, navê ku Ermeniyan lêkiriye

Serejêr: 1-Pêrgav, xwe avêtin/ 2-Navê pêxemberekî/ Pirtükekî Ehmedê Xanî 3-Çivaka koma sewalên mezin/ Şoreşvanekî hevaltiya Lenîn

BERSİVÊN XÂÇEPİRSA HEFTİYA ÇÜYİ:

Çeperast: 1-Şerefname/ Ap 2-Azerî/ Ca/ Ana 3-Mehanî/ Unwan 4-Pb/ Zarîn/ Apo 5-Zîlan/ Ez 6-Nan/ În. 7-Yb/ As/ Bi 8-Aba/ Term 9-Aza/ Lak 10-Esaret

Serejêr: 1-Şampanya 2-Ezeb/ Abbas 3-Reh/ Zn/ Aza 4-Erazî/ Ar 5-Finalist 6-Îran/ Elt 7-Ac/ În/ Bra 8-Maun/ Simko 9-E 10-Awaz 11-Anap 12-Panot

Abdullah ÖCALAN KADIN VE AİLE SORUNU

Derleyen: Selahattin Erdem



KİTÊBA
SEROKÊ
PKK
ABDULLAH
ÖCALAN
Dİ NAV
WEŞANÊN
MELSA DE
DERKET

Weşanên Melsa
Piyerloti Cad. No: 85
D: 2
Çemberlitaş / İstanbul
Tel: 516 72 01

NEQUŞK

Amadekar
Aram Çem

Ji bo neteweyek malkambaxiyeke herî mezin ew e ku dîroka wê ji aliyê hinekên din ve bê nivîsin.

Arnold Toynbee



ŞAHİDÊ ROVÎ DÜVÊ ROVÎ YE

Di wêne de waliyê xwînmij û Kurdkuj li ser milê hinekan e. Ev hinek kî ne? Li gor rojnameya Sabah (berdevkê dewleta Tirk û virrek mezin) waliyê Herêmê Unal Erkan li ser milê xelkê Kurd e.


Ku bi virr û derewan tiştek bi mirov bûbuya bê şik û bê guman heta niha rojnameyanen Tirk giş teqiyabûn ji derewan. Li gor rojnameya Sabah Waliyê herêmê dema li

Kurdistanê di nav gel de digere, Kurd pirr nêzîkî wî dibin da ku wî hembêz bikin. Birastî jî gelê Kurd pirr dixwaze wî hembêz bike lê çi fêde, li der dora wî herdem bi deh hezaran tîmîn taybetî, polîs û cerdevan hene û destê gelê Kurd bi tu awayî nagihîjê. Ger destê gelê Kurd bigîhştayê zanibû dê çawa Unal Erkan hembêz bikira. Helbet dê ew roj jî were.

Li ber zarokê te dikevîm

Cenewar elameta wehşîtiyê Kurdan bikuje. Siûda me xeratê dinyayê hemû nika-ye. Gerçî eslê cenewar heye ku ev mîrik ne leşker e rîbûn tabûtên me xelas bikirana. Nusret bi yekî û duduwan qayîl nabe, hê qalê mîrik 22 heb ji me neqandine, weleh me işe wî rehet kiriye, me ji xwe re neqandin, çavên wî lê ye ew ji xwe re bibe. Ma lawo tê van 22 mebûsên Kurdan bi ku ve daleqînî, wê kîjan sêpe xwe di bin wan de bigire. Hele însaf û ilim bi te re tune ye, ma aqlê te jî tune ye? Kurro ku ji te bê û tu wan daneliqînî tu ne ji bavê xwe bî! Ne wê dûre dinya dewleta te daleqîne, kurro bê aqil.

Min tu dîtî, wek pisîkekî ziyanok tu newêriji qula xwe derkevî û di qula te de jî neh deh polîs te mihafeze dîkin. Yanî mehkema te DGM mehkemesî ye lê rebenê dewletê bi zorê te dike bin guvencê. De hema xwediye xwe û vî aqîf. Biner bê tê bigîhê ku. Ez Birûkê jî xerabtir e ku bi ya destê wî de ba û tewer şeva li ber te nahevîm lê ez li ber wî bibe, wê temamê me Newrozê li Şîrmexê ba zarokê te dikevîm...



Nusret Demiral

TİR

Musa Anter



Sokrat

Dî heyata miletan de çax hene wek demsalan in. Bê çawa havinê fêkî çedibe, di wan deman de ji wiha însanên mezin çedibin. Însanên mezin û zana ji miletê xwe re dibin wek koçanên tapûyê. Miletê wan bi wan mezinên xwe û zanebûna wan dibe xwediye welatê xwe û miletê xwe. Di tarîxa Yewnana Kevin de ji dereke wiha heye. Çend mezinên wan hene, bi dû hev de gîhştine ku îsal 2400 sal in ji miletê xwe re bûne stûn. Stûnek ji wan yê herî mezin û meqbûl ji Sokrat e. Heyata Sokrat enteresan e. Ez texmîn dikim ku Sokrat ji ji Rojhilata Navîn bûya wê jê re bigotana pêxember. Tim li ber cahiliyê û zilmê rabûye. Heta ku feqîro di vê riyê de bi destê hikûmeta xwe ya Atîna hatîye idamkirin.

Kitêbên wî pirr in. Gelek ji kitêbên wî pişti mirina wî, şagirtê wî Eflatûn dane hev. Ma ci di kitêbên wî de tunene. Hema tu bê çi tê de heye. Ehlaq, dîn, orf û adet, eşq û zilm, sosyoloji û gellek şireten din. Di vir de meqseda min ne ew e ku ez heyata Sokrat hemû binivîsim. Meqseda min ew e ku ez bînim bîra xorîn Kurdan:

Di vir de ezê mîsaled wî bînim. Ji bo bêhnfirehtî û rehetiya însen:

Dewlemendekî Atîna ku bi malê dinyayê serê xwe dewixandîye, geleki aciz e, ji kê rê dibêje, dibê heyra ji nav işe xwe derkeve ji xwe re hinekî bigere. Mîrik bi a wan dike. Ji Atîna bi gemîyeke xwe ya xisûsi li hawîrdorê Derya Sipî çiqas cihekî xweş hebe digere. Car dî dizivire tê Atîna. Lî hîn serê mîrik tevlîhev e û bêhna wî fireh nebûye. Diçe cem Sokrat mesela xwe jê re dibêje, Sokrat dibê xebera te ye, heqê te heye, ji ber ku te serê xwe ji bi xwe re birbû.

Helbet wê serê xwe bi xwe re bibira. Ma bê serî biçuya ku? Lî qesta Sokrat ne bê mantiqî ye, ji xwe mantiqê klasikî niha di desten me de eserên Sokrat, şagirtê wî Eflatûn û şagirtê Eflatûn ji Arîsto ye.

Yanî di vir de Sokrat ji me hemûyan re dibê, li siheta xwe bînerin, ma ku we serê xwe bi timayê xerakir, êdî hûn dê bi kêrî ci bîn? Însan dibe wek tifingek xerabe ku netewe. Gerçî di wextê Sokrat te tifing û barûd tunebû, lî di vê manê de dibêje.

Min li jor jî got, ewqas işe me Kurdan heye ez nikarim wan berdim û dirêj dirêj heyata Sokrat binivîsim. Ma min anî bîra we bes. Yê ku meraqa heyata wî bike kitêbên wî pirr in, bila ji xwe re peyda bikin û bixwînin.

Mîrê Botan û mîrê Behdînan

Mîrê Behdînan û giregirîn dora wî diçine Cizîrê, dibine mîvanê Mîrê Botan. Mîrê Botan, gellek rûmet dide Mîrê Behdînan, xwarin dixwin, li ser tevger û rewşa welatê xwe, bi gelê xwe re dikevine peyvan.

Demekê Mîrê Botan gazî xulamê xwe re dibêje: "Lawo Çelo; te marîfeta Elo dît. dema ku Mîrê Botan bibe mîvanê me, girîng e ku em ji marîfeta xwe şanî wan bidin." Çelo dibêje: "Tu meraq meke Mîrê min."

Pişti salekê, Mîrê Botan dibe mîvanê Mîrê Behdînan. Mîr gellek rûmet şan dide û dixwaze hunerek xwe pêşkêş bike ji Mîrê Botan re. Mîrê Behdînan dibêje: "Çelo here filan rezî, filan mîwê ji me re tirî werfine." Çelo dibêje: "Bila Mîrê min." Çelo derdikeve û diçe. Mîrê Botan di nava sohbata xwe de dibêje: "Elo selika xwe tije tirî kir. Mîrê Botan her dibêje Elo ji nava rez derket, Elo, kete rê, Elo gîhişt ber derî." Mîr dibêje: "Elo tu hatî!" Çelo dibêje: "Mîrê min qet nepirse, dema ku ez ji hizûra te derketim û heta niha ez li çaroxa xwe digerim." Mîrê Behdînan dîsa li hember Mîrê Botan dikeve şermê...

Seyda Mihemed

Mela Evdilayê Timoqî

● Dîndariya Mela Evdila û bi hezaran dîndarên welatparêz vê baweriyê dane gelê me ku Kurd neteweyeke dîndar e û hiba welatê wî ji dîndariya wî tê. Her wisa Mela Evdila pira di navbera pîr û ciwanan, mektebî û medreseyiyan de bû. Bi gellek mirovan da qebûlkirin (pejirandin) ku doza welatparêzî û azadiya neteweyî di ser her tiştî de ye û girîngirînê hemû baweriyên olî û felsefi ye.

Kalêciwan

Min Seyda di sala 1964 an de di Mitînga Daxwaza Damazrandina Uniwersîta Diyarbekir de dît û me hev naskir. Mitîng li Derê Çiyê civiya û gelek însan beşdarê vê mitîngê bûn. Hingê ku tê bîra min, hevalên welatperwer ji Cizîrê heya Rihayê, Wan, Mûş û Bingolê giş

amade bûbûn. Silîvî, Bayîkî, Xerzî, Batmanî, Sorekî, Dêrikî û gelek derêne din bi navê herêma xwe beşdarbûbûn.

Mela Evdila di nava koma Xerzî, Farqînî, Bayîkî û Batmaniyan de bû. Bejneke bilind û bi heybet, rûyekî sîpî û nûranî, bi qiyafetê gundiyên Xerza, şebqa wî li serê wî û di destêne wî yêne

pîroz de panqertek bilind hebû. Ew ên ku hatibûn mitîngê Seyda bi ber çavên gişan ket. Li ser pankarta Mela Evdila: "Bati'ya Fabrika, yol. Doğu'ya Jandarma Karakol." dihate xwendin.

Mela Evdilayê Dilovan û gorbuhuşt, panqarta destê xwe bi saetan bilind girt û dananî. Em hevalên welatperwer giş çûn xêrhatin lê da. Wî moralek pirr zexim da vê civînê. Amadekarên mitîngê Seyda dawetî kursî kirin. Seyda gellek pirsên xweş gotin û mitîng germ kir.

Ew ên ku vê mitîngê çêkirin xwendavanen bajarên Diyarbekirê bûn. Wek Wehbî Debaxoxlu, Dr. Sil-

hedîn û Şewket Beysanoxlu. Bajariyên Diyarbekirê gava ku dîtin, Mela û Feqî û welatparêzen gundi çend qatêne wan in, ew jî mane heyirî...

Gava ku mitîng hate çêkirin berî bi çend rojan xebra me pê çêbû. Hevalên welatparêz gazî seranserê welat kirin û herkes hat cihê xwe li vê mitîngê girt.

PÎRÊ NAV CIWANAN

Çawa ku tê bîra min; temsilciyek ji TIP, Seîd Elçi, Elî Qerehan, yek xetibek qenc û bê tirs bi navê Mistefa ji Sorêkê, Mistefa Akkoyun an jî tiştek wilô bû. Mela Evdilayê Xerzî û yek dido ji bajarîyan. Bajariyan nedixwest dile dijmin bihêlin. Belkî jî ditirsiyan.

Seydayê Mela Evdila inسانek pirr bi bîr û bawer bû. Bawermendê Olî û neteweyî bû. Hibba (evîna) welat ji bo seyda riknekî dînî, hîmê ol û olperestiyê bû. Ji ber ku gelek dîndar bû, rûmeta wî li cem hemû Şêx û Melayên wek Mela Mihyedînê Hawêlî û yên wek wî dilpaqîj û dilovan hebû û ji Seyda gelek hezdikirin. Ev dîndariya Mela Evdila û bi hezaran dîndarên welatparêz vê baweriyê dane gelê me ku Kurd neteweyeke dîndar e û hiba welatê wî ji dîndariya wî tê. Her wisa Mela Evdila pira di navbera pîr û ciwanan, mektebî û medreseyiyan bû. Bi gelek mirovan da qebûlkirin (pejirandin) ku doza welatparêzî û azadiya neteweyî di ser her tiştî de ye û girîngirînê hemû baweriyên olî û felsefi ye.

Di sala 1964 / 65 an de em ên ku me welatparêzî dikir em giş ciwan bûn. Kekê Mûsa, Canip Yildirim, Dr. Tarik Ziya, Faiq Bûcak, Kêmal Badillî, Şewket Bînbaşı, Mela Zekiyê Xerzî û wan hevalên mîrxas ku navêne wan nehatin bîra min, ew ji me mestir bûn û bawermendiya wan pirr moral û cesaretê dida me. Navê Mela Evdila û Fehmiyê Bilal jî di navâ van rûsiyîan de divê derbas be. Mela Evdila ji Medresê, Fehmiyê Bilal jî ji dibistanê hatibûn û ev herdu mîrxas di armancek de gihabûn hev. Ji baweriyê xwe yên dînî û felsefi jî van herdu camêran qet tawîz nedan. Bi min meşa van herdu mîrxasan li hev dixwe. Şopa

wan ji hev e.


Van rûsiyîen Kurd nîşanî me didan ku agirê şoreşa Kurd nevemiriye. Pizotê gir û bi can di binê xwelî-germê de mane. Ev pizot ji bo şoreşek nuh û pîroz maddeyên pîr girîng bûn. Xort û ciwan bi van egîdan ve digan hev, dilê xortan bi van xweş, bawerîya wan germ û ges dibû. Wê demê demek tarî bû. Dawiya kerredengiyê, serpêka siyariyê bû.

SEYDAYÊ BÊ TIRS


Cara duyemîn min Seydayê Timoqî li bendexana Diyarbekir di bihara 1968 an de dît. Meha Adarê li hefsa Diyarbekirê em 11 kes gitribûn. Seîd Elçi, Şemsî Hosta, Zubeyîr Yildirim, Emer Turhan û Şefiq Issi ji van 11 an yên ku çûne dilovaniya heq. Em 6 ji wan girtiyan sax in. Seyda hat serdana me. Em gelek pê xweş û bi rûmet bûn. Diçû hecê. Ferza xwe ya olî ji stûyê xwe dikir. Deynê xwedê dida. Belê hatibû destûrê ji me dixwest. Me destûr nedana seyda, ew ji nedîcû. Em çar kes ji berpirsiyaren serokatiyê girtî bûn. Sekreterê me jî Seîd Elçi bû. Me destûra Seyda da bi şertek; me go ku tu herî cem gora pêxember û ji Kurd û Kurdistanê re dua bîkî. Seyda kîfxweş bû, kenî û wiha go: "Qey ez ji bo ci dicim? Ez ji bo dua dicim."

Li welatê Xerza ku bê pirskirin ka Seyda yekî çawa bû, bersivâ vê pirsê ev e ku berî her tiştî Seyda inسانek bê tirs û bi xîret bû. Xîreta wî beriya her tiştî lê dixwîya. Ji dervabû Elî Şerî Dêrsimî, Fehmiyê Liceyî û rîber û şehîdîn nemirê Kurd ci bin Mela Evdilayê Xerzî ji ew e. Li vê dinê di dilen me de dijîn û namirin. Li wê dinê li ba ewliya, enbiya û şehîdîn serhildana hemû gelên bindest in.

Bi salan û salan zingil di dest de hejand, neteweyê xwe şiyar kir û newestiya. Di vê rî de nav û dengê wî jî bilind bû, çawa ku Cegerxwîn dibê: "Di vê rî da bilind bûme. Giham Gerdûnê Seyyarê." Nav û dengê Seyda li hemû aşarê welat bi ser çiya ketiye û li deşt û zozanan gund û bajaran digere. Cihê wî buhuşa rengîn be; nav û dengê wî wê her hebe...



Mela Evdilayê Timoqî bi Serokê PKK û Abdullah Öcalan re



Viktor Hugo: Carna bi kêt, carna bi xiyal û carna ji xerib...

Çilkezî Keskin

Viktor Hugo di sala 1802 an de hat dinê. Ji ber ku bavê wî leşker bû, salên xwe yên za-roktiyê bi gerran derbas kir. Bi pirranî di van salan de şer hebûn. Hugo ji xwendinê re pirr bi meraq bû. Lewma ji wî xwendin û nivisîna xwe bi xwe hîn kir. Di dibistana destpêkê de lafinî fêr bû. Voltaire, Diderot, Rousseau û tiştîn ku di dermafê helbestê de diketin destê wî bikêfxwesi dixwend. Dema ku wî dest bi nivisîna helbestan kir hê sêzdeh salî bû. Viktorê biçûk di wextekî kurt de pêşveçûnekî balkêş nîşan da. Xelata (odula) xwe ya yeke-mîn di panzdeh saliya xwe de, bi beşdarbûna pêşberkekî (yarişmayekî) helbestan stand.

Berhemên wî yên herî bi nav û deng ev in: Belengaz, Not û Sê, Ceza, Dema li Sirgûnê, Norte- Damê Parîsî, Mirovê ku Dikene, Roja Da-wîn a Girtiyekî, Claudiê Xizan, William Shakespeare, Pelên Payizê û Dengêni ji dil.

V. Hugo mirovekî pêşverû,



kirin ku Hugo hemdemê Pûşkin û Lermontov bû. Hu-

demokrat û alîgirê gel bû; ew heya dawiya jiyana xwe, bi van prensîban ve girêdayî ma. Hugo yek ji wan nûnerên romantik e. Lê navê wî di nav romantikên demokrat de tê bibiranîn. Nemaze divê bê diyar-

nermendê mezin wek hemdemê Tolstoy û Dostoyevski mir. Herwiha em bandûra van niviskaran jî li ser Hugo dibînin. Di jiyana wî ya direj de ne bi tenê ramanen wî, di dîtinê wî yên edebî de jî guhertinê

V. Hugo mirovekî pêşverû, demokrat û alîgirê gel bû; ew heya dawiya jiyana xwe bi van prensîban re girêdayî ma. Hugo yek ji wan nûnerên romantik e. Lê navê wî di nav romantikên demokrat de tê bibiranîn. Nemaze divê bê diyarkirin ku Hugo hemdemê Pûşkin û Lermontov bû. Hunermendê mezin bi hemdemîya Tolstoy û Dostoyevski mir.

mezin çêbûn. Di rûdanen civa-kî de hergav alîgiriya hêzen

Dehayek lebatkar



Vîktor Hugo

pêşverû dikir. Ew bi yi tawie xwe jî di dîrokê de tê bibiranîn.

Viktor Hugo berî her tiştî niviskarekî gel e. Di nav sedemê ewqas bi nav û dengbûna wî de; jiyana sirgünê, tawre siyasi, di jiyana civakî de xesasiyetî, jîrikî û di nivisan de zimanê wî yê xweş rolekî girêng distîne. Xwendevan di kîjan emri de dibe bila bibe ew bersiva daxwazan xwe di nivisîn Hugo de dibîne. Ew di berhemên xwe de hemû tiştî bi eşkereyi radixe ber çavan. Carna jî ew bi pêlên herikîn ên giyanê re û di nav dengen bi sér ên dinê de winda dibe. Carna bi kêt, carna bi xiyal û carna ji xerib...

Ew mirovekî lebatê ye. Bi lebatkariya xwe hergav azadiyê diparêze, li dijî despotiyê dertê, aştiyê diparêze û di nivisîn xwe de hovîtiya cezayê mirinê diqîre. Hugo ji gelê xwe re hurmetkar û ji gelên din re jî rîzdar e. Ew mirovek bi nîjad û hemû lebaten wî bi mirovî ne.

Viktor Hugo di sala 1885 an

Fate vana:

"Ne lawo, lawo tuyâ he-te cîmera yena tuça uwa xo nîsimite?"

Sil vano:

"ere mire uwe biya, ez teste merdnie."

Fate çape uwe ana ki simeno. Gineno cilero hot roj cilede maneno.

Hot rojra tepiya yenora xo vano:

"az ke reyna hewla wen nîzan çik çik borine"

Tove keno reyna hewla nîweno.

Wusxan

de ji ber nexweşîna qelb û kezeba sipî, çû ser dilovaniya xwe. Lî beriya ku bimire wî têkoşînek mezin bi nexweşîn xwe re kir. Hugo ji vê dema beriya mirina xwe re dibêje: "şerê rojê û şevê".

Notek:

Di vê nivisê de "lebat" di suna (cihê) eylem (action) û de hatiye bikaranîn. Em dibînku di hin nivisan de peyva "livbazî" tê bikaranîn ku bi dîtina min ev çewti e. Lewra "liv" bi xwe jî ji "lebitîn", ji "lebatê" tê. "Bazî" peyvekî bi farisî ye. Ji "bazîkerden" û tê. Bazî leyistik, bazîkerden leyîstîn e. İcar "livbazî" çawa dibe eylem (action)? Divê li ser peyvîn bi vî awayî bê rawestin.

Tebat Lebat

Raweya radar: Tebitîn

Raweya radar: Lebitîn

Raweya fermani: Bîtebitî

Raweya fermani: Bîlebitî

Dema niha û fireh

Lêker: Tebitîn

Lêker: Lebitîn

Ez ditebitim Ez dilebitim

Tu ditebitî Tu dilebitî

Ew ditebite Ew dilebite

Em ditebitin Em dilebitin

Hûn ditebitin Hûn dilebitin

Ew ditebitin Ew dilebitin

Ez ditebitim: Ango ez diskinim an ez li cihê xwe rûniştî me hwd...

Ez dilebitim: Ez li ber rabûnê me an ez rabûme, ez... dikim... hwd.

Ez tevger dikim: Di vir de eylem (action) a germ heye.

Lebatkar: Yê ku dilebite, karê lebatê pêk tîne;

Ango eylemcî Dr. Kamûran Alî Bedirxan jî di pirtûka xwe ya bi navê "Gramera Kurdi" de peyvîn lêkera lebatî (aktif fil) û lêkera tebatî (pasif fil) bikartîne.

Hewla

ne somi birmeno ano. Silema kunora ci nu ve hewlara weno qedeneno. Urzenora perune non û hewla dano çeverde be-no tever. Hernêna xo keno kunora raye sono dewe, raye-ra beno tesa, yeno heniye de-re kemere kungde uwa xo si-meno kunora raye tenena so-no onca beno tesa. Xo çar-ne-nora oxniye sono oxniyede uwa xo simeno onca kunora raye sono. Onca beno tesa.

"Fate mire uwe biya."

Saxsegra mordeme beno hewlara zaf haskeno. Name na mordem Silema be-no. Cunu ke danewe hekin roseno Peru ceno sono Dersim Loqante. Masawa de tekede niseno ru. Xiz-merkar yeno, Silema vano: "Ero mire Hewla biya."

Xizmerkar sono tose hewla ve nona ceno yeno. Silema vano:

"Biko eke besekena mire hewla ve qutuya biya."

Xizmerkar sono qutuya hewla ceno ano vere Sile-mande nano ru. Hire ki no-

Kurd û Masmêdiya li Fransa ji dema cengê ve

Amed

Ji ê xwendevan re pêwist nakek mirov rola masmêdiya nîşan bide. Em tev dizanin ku çeketî heví mezin e. Em ê tavilê nimûneyan râberî xwendevan bikin:

ÇAPEMENIYA ALIGIR

-Radyoya Ereban "Radio Orient3 li Parisê berê ji Bakûrê Kurdistanê re digot: "Kurdistan Tirkîye: ne tenê Sedam Husen li Kurdan dixe, Tirk jî li Kurdan dixin, niha dibêje: "Başûr-Rojhilat: Tirkan ewqas terorist kuştine!"

-Rastêr Fransa, anglo oposizioniya li dijî Sosyalîstan, rojnameyeke wan heye, navê wê "Le Quotidien de Paris" e. Gava John Major Mesûd Berzanî berî du mehan vexwend (dawet kir) Îngilterre, vê rojnamê rabû gotareke dirêj bi navê "Xewna Oto-manî" belav kir. Tê de serê Dewleta Tirk kir, cîma hingê Dewleta Tirk xwe da bû aliyê Amerika. Herwekî Rastêr Fransa dijminê Kurdan û dostê Ereban in, gotina "Kurd" ci ye di gotara wan de nehat. Hema mîrkan gotina "Kurd" jî neanîne ser zimanê xwe ku pê serê Dewleta Kema-list bikin.

Hê Mesûd Berzanî lingê xwe danenibû ser axa Îngilterre, balafirêr Tirkan li Kurdên Başûr dan. Di van bombekirinan de gerék e destê Amerika tê de hebe, cîma Îngilterre li dijî "Bush's New World Ordre" (Nîzama Nû ya Dînyayê ya Bush) e. Sosyalîstan Fransa jî dînihîrin hele kaçî ji rûniştinê Mesûd Berzanî û J. Major derdikeve. Di wê navê de, televîzyona Sosyalîstan Fransa roportaj li ser rewşa Kurden Başûr derdixistin. Di wan roportaj de hinekî "Misilmantiya Kurdan" nîşan didan! Bi gotineka dinê, eger Kurd xwe bidana aliyê Îngilterre, wê serê me biki-rana.

PIRSA KURDAN Û SEROKÊN EWRÜPÎ

-Çend meh pişti cenga Giravê (Golfe, Korfez), radyoya France-Info careke tenê got: "François Mitterrand dijî serokê Espanya, Filip Gonzales, dibine da ku konferansê navneteweyî li ser pirsa Kurdan cê bikin! Konferansa ci û halê ci! Bê gûman, hingê pirsa Kurdi weki zorekî li ser pişta rîjîmân dagîrkerên Kurdistanê bi kar tanîn da ku bê birr (ser) armancê wan yên siyasi bi cih bînin.

-Ji bo ku serê Sosyalîstan bikin, rastêr Fransa careke li dijî Kurdan nîşandin û gotin ku "Kurd Aşûrî û Keldaniyê File" dikujin. Sosyalîstan Fransa rabûn sê rojan li ser hev nîşandin û ew nûcê derew derxistin û pişta Kurdan girtin.

-Gérard Chaliand, Trotis-kîyê doh û Taşnaqê iro, Kurd di

pirtûka xwe de wilo nîşan dane: Miletikî prîmîfîn in, ji kuştinê pê ve ji tiştekî re nabin, de bila em jî ji bo armancê xwe yên siyasi ji xwe re bi kar bînin!

-Televîzyona Rastêr Fransa ya 5-ê Kendal Nezan vexwend. Berî ku wî bidine deng kirin, rabûn roportajek li ser Kurdan derxistin û tê de wisa gotin: "Kurd miletikî paşketî ye, tev eşîr in, xwedî gelek zarav in, û hwd..." Kendal Nezan bersiva wan baş da û kîla wan kire cih. Nimûna İtalya ji wan re anî.

-Erdal İnonu gava hat François Mitterrand dît, rojnamevanê Ereban vê pîrsê jê kirin: Guftûgoyen we û İsrail li ser avê gîhistine ku?

-Ermeniyê Fransa ji bo qirkirina xwe ya 1915 gelek xebat kîrine. Du-sê dezgehê (institution) navneteweyî vê qirkirinê na-

Elizabeth Picard di rûpela yekê ya pirtûka xwe de Kurdistan wiha nasandiye: Erdê Kurdan li İraqê, li İranê, li Sûriyê û li Tirkîye dikeve, lê ne tenê Kurd tê de rûdinin! Di eyîn rûpelê de gotiye ku Kurd pîr zimanê diaxivin. Gava me jê pîrs kir, te cîma wiha nîşandiye? Got: Joyce Blau, "Kurdnasa Parisê", ji me re gotiye.

sîne. Dixwazin ku dewleta Tirk bi xwe jî wê qirkirinê bînaşê. Vêca, ji bo wê berî çend salan mornamak (petition) amade kîribûn. Rehmetî Yilmaz Guney jî dengê xwe dabû û mor kîribû. Ew morname wan rojan di rojnamen Fransizî de belav kîribûn. Li kîleka her kesê ku dengê xwe dayê zanav an navê dewleta wî nîşan da bûn. Taşnaqan ji bo Yilmaz Guney navê dewleta "Tirkîye" danî bûn. Rehmetî Yilmaz Guney ceyî bi wan kir, wan xirabî pê kir. Berê li Rewanê (Yêravan) "Kurdnasi" hebû, niha navê "Kurd" jê hilanîne!

NÎVZANEKE EWRÜPÎ

-Elizabeth Picard di rûpela yekê ya pirtûka xwe de Kurdistan wiha nasandiye: Erdê Kurdan li İraqê, li İranê, li Sûriyê û li Tirkîye dikeve, lê ne tenê Kurd tê de rûdinin! Di eyîn rûpelê de gotiye ku Kurd pîr zimanê diaxivin. Gava me jê pîrs kir, te cîma wiha nîşandiye? Got: Joyce Blau, "Kurdnasa Parisê", ji me re gotiye. Kurdê ku semîner cê dikir ji Joyce Blau pîrsiye cîma wiha gotiye, J.B. zimanê xwe li hev gerand!

-Da ku armancê xwe yên siyasi veşere, Gérard Chaliand li ser qaba dawiyê ya pirtûka xwe de wisa nîşandiye: Enstituya Lîkolînan a Neteweyen Yekbûyî (ONU) ji min xwestiye ku ez raporekî li ser rewşa Kurdan a vê dawiyê binivîsinim!

-Gava Kurden Başûr perçê xwe rizgar dikirin, televîzyona Rastan, TF1, digot: êdî ala Kurdan li şûna ala İraqê bi dar ve

-Di dema cengê de, masmêdia "New World Ordre" ji dijminê xwe re digotin: Misilmânîn sergerm li Rojhilata Navîn serî hildane. Sibe ev diyaraye (phénomène) li ser demokrasiye xetereke mezin e. Rastêr Fransa jî xwest vê keysê (firset) bistîne û Kurdan jî "Misilmânîn sergerm" nîşan bide. Roportajek xwe ya cê kirî nîşan dan, ne mîzgeft tê de hebûn û ne Kurd tê de hebûn! Elizabeth Picard jî di pirtûka xwe de gotiye ku ne dûr sibe Kurd jî rîjîmeke İslâmî ava bikin!

-Elizabeth Picard sûretekî çend zarokên Kurdan di bin konekî de li ser qaba pirtûka xwe xistiye. Li dawîya pirtûkî gotiye ku Enstituya Kurdi ya Parisê vê sûretê daye me. Helbet, ev gotin wê rast be, lê Enstituya Kurdi, bê gûman, wê pîr sûret dabine wê.

Wê jî çûye ji nav gişan sûretek bijartîye ku pê sûretê Kurdan nexwes nîşan de.

-Gava F. Mitterrand çû gurzek gul danî ser gora Ataturk, mîdiya Sosyalîstan digot: çûye li ser mesela Kurdi bîaxive. Rastêr Fransa jî digot: F. Mitterrand çûye li ser mesela Kurdi bîaxive, neçûye li ser ketina Tirkîye di Bazara Hevbeş a Ewrûpî de bîaxive. Wisa, rast dixwazin bêjin: We bala xwe dayê, Mitterrand xema Kurdan xwariye, ne xema Yekîtiya Ewrûpa xwariye! Herdu serîyan rûyê xwe reş dikirin, dixwestin pê serê hev bikin, lê Kurd bi kar tanîn. Sosyalîstan bi Yekîtiya Ewrûpa re ne, lê Rast li dijî wê ne. Rastan roportajek jî li ser Kurden Bakûr derxistin. Tenê kal, pîr û zarokên gundi di roportaja xwe de nîşan dan. Wan jî digot: "Em jî dixwazin aleke me hebe; dewleteke me hebe". Bi gotineka dinê, Rastan paşverû dixwestin bigotana ku heya ev kalan û pîrên gundi jî bûne tîst û hez dîkin bibin xwedî dewletekê!

-Her cara ku dewleta Tirk li Kurdan dixistin, Rastêr Fransa bi zimanekî wisa dînîvîsin: Bravo, we qenc kir!

-Civînek li Yunanistanê cê bûbû. Radyoya Ereban digot: Abdullah Ocalan, serokê PKK, dixwaze desteserîn (otaj) Almanî di riya Neteweyen Yekbûyî (ONU) re bide dewleta Almanya... Abdullah Ocalan gotiye ku sergeştevanê (tûrîst) Ewrûpî na-be bê vîza me derbasî Kurdistanê bibin... Niha, masmêdia Sosyalîstan dînîvîsin: "Dewleta Tirk dîbîje PKK terorist" e.

-Almanya û çend dewletên dinê xwestin ku Ewrûpî bi wan re li ser mesela Kurdi şerî Tir-

PÊNUŞ

Amed Tigrîs



Çapemeniya Kurdi

Heta niha li ser ziman, edebiyat û kultura Kurdi ya nîvîskî qedexhe hebûn. Lê, niha xwîya û eşkere ye, ku ew qanûnê qedexebûnê, êdî di pratîkê de derbas nabin. Ya herî baştir û rasttir jî ew e, ne bi izin û rîdâna hêzîn kolonyalîst ew qedexhe rabin. Dijberê wê, hêzîn neteweyî û şoresser ew dîwar û pîngarên qedexeyan bi têkoşînî quî kirin û çîrandin. Li welatê me jî wiha bû. İro qanûnê ku di derheqê ziman, edebiyat û kultura Kurdan a qedexekir de heye, êdî kolonyalîst nikarin wan bi kar bînin. Ew qanûnê wan ên nîjadperest û paşverû bi tenê li ser kaxezêñ rîzî man. Ev pêngava Kurdan a pêşin a herî zor û dîjwar bi serket. Niha em di pêngava duduyan de ne.

Pêngava duduyan xweşkirin û geşkirina kurdi ye. Pêngava komkirin û pêkanîna yekîti ya nîvîskar, helbestvan, wêneçêker (resam), hunermend û ronakbirêr Kurdi e. Di vê rewşa me ya iroyîn de, mirov nikare bi xebat û fedakariyên şexsî û komikên biçûk bigîhî derekê. Li hember vê zîlm û zordariya han ne mumkun e. Li hember vê teknîka modern û sermayedariya dêwîn ne karê kesen bi hiş û serwext e. Bi çapemeniya dewleta Tirk re bi serî derketin, hêz û xebateke mezin û dîjwar dixwaze.

Lê, hezar mixabin hîn jî hînek kes û komikên biçûk hene, ku dukanê xwe yên li der ve, dikşînîn hundir. An jî dixwazin bikşînin. Ev ne dukan sabûn firotinê ye. Ev kes û derdorên wiha ji derê xwe nikarin yekê din bixapînîn. Rast e divê di nav weşandên kurdi de pluralîzm hebe, ku reqabet çêbibe. Di reqabet de zixlêdan hene. Rexne û pêşniyari hene. Ji ber vê yekê jî, pêşveçün çedîbin. Qelîte û naverok xwîrt û baş dîbin. Hejmarâ xwendevanan zêde dîbin. İntresa xwendin û nîvîsandina kurdi bêtir dibe. Sewiye bilind dibe. Lê, ne bi dukan û komikên portetîv û koçerî! Êdî ew dem li paş ma. Kes û derdorên wiha heger samîmî bin, pêwist e, ku li alternatifîn cîdî û mezin bigerîn. Ku bi rastî bikarin fêde bigîhînîn çapemeniya kurdi. Di eyîn ko-var an rojnameyê de çend rûpel bi kurdi û çend rûpel jî bi tîrkî nîvîsandin, necidîbûna mirov diyar dike. Lê, ji niha şûn ve, mirov rabe di rûpelên kovar an jî rojnameyekê de rûpelek an du rûpel bi kurdi nîvîsandin, bi dîtina min bi zimanê kurdi henekkîrin (qefkirin) e. Lê, ev nayê wê maneyê ku mirov bi tîrkî nenîvîsîne. Ya bingehîn û rastîn ji vir şûn ve, divê mirov weşanên kurdi û tîrkî ji hevdu cûda bike. Bila her yek bi serê xwe bin. Ma êdî qedexhe jî nema cîma bi kurdi û tîrkî? Cîma ev tevlihevî? Ge-lo bi kurdi nîvîsandin û xwendin zor e? Ma ji şoressê zortir tiştek heye?

kîye bike. Rastêr Fransa nîvîsandin ku Tirkîye bersiv wisa daye: "Cîma Ewrûpa alîkariya min na-ke ku em xwe ji terorîstan xelas bikin?"

ROJNAMEYÊN EWRÜPÎ

-Rojnamevanêr Ermenî li Fransa dixwazin ku leskerên Fransa û Amerika li Tirkîye bi-

list e, lê polîs hema bêje tev Rast in. Gava Rêxistina France-Libertés xwest xwe "mafparêzîn mirovan" nîşan de û pişta Kurdan bigre, polisan êrîş birin ser Kurdan û ew bi zorê bi kutekan belav kirin. Televîzyona Rastan a 5-ê digot: Kurdan xwestine Dêrê (kenîsê) bişewitînîn, polîs çûne alîkariya wan bikin, rabûn bi daran li polîsîn me dan!

-Gava li Newrozî îsal leşkerê Tirk bi tanq û topan êrîş bire Bakûrê Kurdistanê, Sosyalîstan destpêkê tu roportaj li ser Newrozê dernexistin. Rastan ji bo rûyê wan reş bikin, wan rabû roportaj bi dirêjî nîşan dan ku çawa Tirk li Kurdan di-din. Pê re, Sosyalîstan roportajen xwe derxistin.

mînîn, ji bo mafîn Henefîyan, Qadîriyan, Suniyan û belkî Er-menîyan jî!

-Niha rojnamevaniya Sosyalîstan ji bo Bakûrê Kurdistanê dinîvîsîne: "région à majorité kurde" (navça ku pirraniya wê Kurdi in). Ev jî yan di bin tesîra Dewleta Tirk de ye, yan di bin tesîra Ermenîyen Fransa de ye.

-Berî vê çend mehan hin Kurdan ji bo mafîn penabertyê bis-tînîn grêva birçîbûnê kiribûn. Rast e li Fransa Hîkûmet Sosya-

-Gava li Newrozî îsal leşkerê Tirk bi tanq û topan êrîş bire Bakûrê Kurdistanê, Sosyalîstan destpêkê tu roportaj li ser Newrozê dernexistin. Rastan ji bo rûyê wan reş bikin, wan rabû roportaj bi dirêjî nîşan dan ku çawa Tirk li Kurdan didin. Pê re, Sosyalîstan roportajen xwe derxistin.

-Li dema cengê, rojnamevaniya Ermenî dinîvîsand ku Selahî Eyûbî yê Kurd jî mîna Sedam Husen li Tekrîte bûye, ha!

Li ser şopa Ehmedê Xanî

- E. Xanî li ser sedemên bindestbûna civata Kurdan pirralî radiweste û analîza civata Kurd dike. Bi ya wî yê ku civata Kurd idare dikin (mebest Mîrén Kurd in), heke rûmetekî baş bidana ilim û li xebatê zanistî xwedî derketana, dê civata Kurd bi tu awayî ji cîranê xwe paşdetir nema û zimanê kurdî jî dê bibûya zimanekî edebî yê bêhempa.
- E. Xanî li pey damezrañdina civatekî birêkxistî (örgütlü) ye. Civatekî ku sazgeh (kurum) ên xwe ava kiribe dikare ji bêserûberiyê rizgar bibe û pêşveçûnek bi istikrar nîşan bide. Civata Kurd a ku bi eşîrî, qebîlî û mîftîyan ji hev belav bûye, hêza xwe jî winda kiriye. Hêza gelê Kurd heyâ ku neyê birêkxistin (organîzekirin) nikare bikeve xizmeta gelê Kurd.

Felat Dilges

(4)

Di "Nûbara Biçûkan" a E. Xanî de metodekî fêrkirinê heye ku divê li ser bê rawestan. Herwiha em ji Nûbara Biçûkan hîn dîbin ku E. Xanî di warê perwerde û hîndekariyê de mamossteyekî gellek mezin e. Bi saya vî metodê ku helbestvanê nemir diemîline, mirov bi hêsanî dikare bêjeyen zimanekî biyanî hîn bibe.

E. Xanî Nûbara Biçûkan bi helbestkî nivîsiye. Di vê berhemê de bêje bi kurdî an bi erebî têngayin û di pey de têgiha wan (bêje- bêjeyan) bi zimanê din (bi kurdî hatibe nivîsin têgiha wê bi erebî, bi erebî hatibe nivîsin têgiha wê bi kurdî tê nivîsin) tê di yarkirin. Di her beşê Nûbarê de beriya destpêka ferhengê malikek (beyît) giranbuha heye ku xwedî naverokek felsefi ye. Wekî:

Ger dê te meqsûdek hebî Lazim divê lê bêy bi lez Xesma te mebûdek hebî Daim di emrê wî bibez

(17)

Helbestvanê nemir di vê malikê de dibêje, heke mebestekî te hebe divê ku ji bo pêkanîna wê armancê tu bi derengî nemînî û bi lez bî. Ji bo ku mirov bigihîje armanca xwe û bi miradê xwe şâ

bibe divê ku mirov bilezîne û hewldan nîşan bide. Bi rawestanê mirov nikare bigihîje armancê. Nemaze ku pêrestgehek (mebûdek- Xwe-dayek) mirov hebe, divê ku mirov hergav di emrê wî de be.

Di pey malikê de nezm (qalib) heye ku xwendina helbestê li gor pîvana nezmî ye. Ev nezme li gor her besen ferhengê diguhurin. Nimûnek ji ferhengê:

Hatim eteytu, eeti têm
Wi (ew) hat eta, iytî were
Ateytu min da, xuz bigir
Îrcî veger, izheb here.

(18)

Di vê malikê de bêjeyen yekemîn bi zimanê erebî, bêjeyen duyemîn bi zaravê kurmancî ne. Eşkereye ku mirov, ev bêjeyen ku bi vî metodî hîn di be zû bi zû ji bir nake. Bi vî metodî hem qalib û hem jî hevdengiya bêjeyan fêrbûnê hêsanîr dike. E. Xanî di mijara perwerde û hîndekariyê de mamossteyekî pispor e. Ew dibistana ku wî ji bo zarokên Kurd ve kir û perwerde û hîndekarî tê de bi zimanê kurdî bû, hebûna xwe bidomanda û dibistanen bi vî awayî li devêrin din ên Kurdistanê jî bi hatana vekirin, dê rewşa zimanê kurdî û herwiha netewaya Kurd ji hemû awayî dê çêtir bibûya. Gelek mixabin

piştî koçkirina mamosstê nemir kevneşopa wî nehatiye domandin. Bi tenê em dizanî piştî mirina E. Xanî şagirtê wî Smaîl bist salan di vê dibistanê de dersên xwe bi zaravê kurmancî daye û li ser şopa mamosstê xwe çûye. (19)

HOZANÊN KURD Û ZIMANÊ KURDÎ

Li ser ferheng û rîzimana kurdî xebitîn, bibê nebê tekstên kurdî yê kevn jî râçavkirinê û li ser wan xebitînê bi xwe re tîne û anîye jî. Herwiha E. Xanî ew kesen ku li ser zimanê kurdî xebitîne û berhemêne xwe bi vî zimanê dane baş dinase. Em ji Mem û Zînê têdigihîjin ku E. Xanî rûmetekî mezin dide ew helbestvanê Kurd ên ku berhemêne xwe bi zimanê kurdî dane. Helbestvanê nemir li kurdî xwedî dermeketin û rûmetnedayina helbestvanê Kurd ên kevin, bi rewşa siyasiya Kurdan ve girêdide. Li gor dîtina wî heke Kurd bindest nebûna û welatê Kurdan nehatiba parvekirin, wê gavê dê tevê dinê dewlemendiyâ zimanê kurdî û girîngiya hozanen wekî Melê Cizîrî, Elî Herîrî û Feqiyê Teyran bizanibîya. E. Xanî bi vî awayî dinivîse:

Kurmanc ne pirr di bê kemal in

Em di yetîm û bê mecal in

Filcimlene cahil û nezan in

Belkî di sefil û bê xwedan in

Ger dê hebûya me jî xwe danek

Alikeremek letîfedanek

Ilm û huner û kemal û izan

Sê'r û xezel û kîtâp û dîwan

Ev cins bibûya li ba wî mamûl

Em neqdi bîba li nik wî meqbûl

Min dê elama kelamê mewzûn

Ali bikira li banê gerdûn

Bîna ve riha Melê Cizîrî Pê hey bikira Elî Herîrî

Keyfek wê bida Feqiyê Teyran

Hetta bi ebed bimayî heyran. (20)

AZADÎ

Abdurahman Durre



Cureyên azadiyê

A zadî li ser çend cureyan ava dibe, cureyên wî yê girîng (mu-hîm) sisê ne:

- Azadiya rîzanî (siyasî)
- Azadiya hîş û bîrî (fîkrî) û çandî (kultûrî)
- Azadiya aborî (ekonomîk-îktisadî)

Azadiya bi rastî ev e, ku mirov di rîzanî, bîr, fîkr û aboriya xwe de azad be, di binê tesîr û bandûra tu kesî û tu dewletî de nebe, mirov azad e. Ger yek ji van azadiyan kêm bimîne, mirov bi rastî û tevayî azad nîne, kole û bindest e.

Mirovekî an ji gelekî, ku bi serê xwe nîn be, rîzaniya xwe li gor xwestina xwe nemeşîne, ew ne azad, lê belê kole ye. Herwekî ku di aborî û bîra (fîkr) xwe de jî ne azad be, dîsa ji kole tê hesabê. Ji ber vî awayî, yê ku mîjîyê wan hatine şûştin ew serîşkî û yobaz in.

Yê ku, karê wî, xaniyê wî û lîsuwar (erebe, hesp) a wî tunebe, ew jî bi temamî ne azad e. Karkeren di bin destê patronan de ne azad in.

Belê ne azadbûna rîzanî ji hemû curêne azadbûnê girantir û zortir e.

Ew gelêne ku di bin destê gelêni biyanî de dijîn, çiqas jî dewle-mend bin, xwedî mal û debdebêne giran bin jî, ne azad in, kole ne. Di ola îslâmî de jî, li ser koleyan, zekat, hec, nimêja ïnê ne ferz e. Şertê ferzbûna wan azadî ye.

Ew ên ku fîkr û bîra wan nexebitê û serbest nefikir in û bi serê xwe nikarîbin tiştan ji hev derxin û di binê tesîran de mane, ew jî ne azad in, kole ne, lê bi koletiya xwe jî nizanîn, ev jî koletiya herîpis û giran e.

Kesê ku qenc nefikire, rind ne zana be, hişê xwe baş nexebitîne, nikare azad be, tim û tim kole dimîne. Ji ber vê ye ku dewletîn zordest, dijiminê rewşenbîr û zanayêne gelêni bindest in û alî-kariya bêhiş û nezanenê wan dikin, tu car naxwazin ku gel hişyar û zana be, bi her dek û dolaban wan bê hiş û bê bîr dihêlin.

Mêtîngehkar (somurjeci) her tiştîn gelêni bindest ji wan didi-zin û distînin, eqlê wan, mîjîyê wan qirîjî dikin, ziman, çand, ke-lepor û folklora wan çîrto wîro dikin, dîroka wan berevajî dikin, belgeyêne wan ên dîrokî talan dikin, her tiştîn wan kêm, û erzan dikin, bi vî awayî jî xwîrtî, zîlm û zora xwe didomînin.

Gerçî dawîya zîlmê pûc e, zîlm pirr nadomîne, lê ku mirov hişyar û zana be. Di Quranê de ayatek wiha heye: "Wê zalim bibînin ku çawa serserî bikevin."

Belê hiş lazim e hiş... Mirov hêjayedê çibe, Xwedê ew dide mirov. Mirov heta bê hiş be, bindest û belengaz dimîne.

E. Xanî li ser sedemên xelas neke. Ev e baweriya fi-bindestbûna civata Kurdan pirralî radiweste û analîza civata Kurd dike. Bi ya wî yê ku civata Kurd idare dikin (mebest Mîrén Kurd in), heke rûmetekî baş bidana ilim û li xebatê zanistî xwedî derketana, dê civata Kurd bi tu awayî ji cîranê xwe paşdetir nema û zimanê kurdî jî dê bibûya zimanekî edebî yê bêhempa.

ZIMAN Û NETEWEBÛN

E. Xanî pêşveçûna zimanê kurdî bi pêşveçûna netewaya Kurd ve gîrêdayî dibîne. Heke gelê Kurd sazgehêne xwe damezrandan û dewleta xwe ava bikira, bêguman dê li zimanê xwe jî xwedî derketa. Lî heya ku gelê Kurd ji mantika qebîlê û eşîriyê rizgar nebe, dê pêşîra xwe ji sefili (belengazî), yetîmî û bêmecaliyê (bêtaqetiyê) ji

62

FEQI HÜSEYN SAĞNIC

pêseriya hewisina zimanê kurdi
kürteçé öğrenme metodu

DERKET

Weşanên Melsa

Piyerloti Cad. No: 85
D:2
Çemberlitaş / İstanbul
Tel: 516 72 01

Bâzı Navînda Çonda Mezopotamya Jorîn: 2

Çemberlitaş Çekirge İstiklal Mah. 25. Sokak No: 12/2
53330 Çemberlitaş / İstanbul
Tel: 0212 516 72 01

Nalet lê be yê ku ne şiyar be

Rovî li rizqê xwe digeriya. Geriya geriya, rastî kewekê hat. Çû çû, nêzîkî kewê bû, sekinî. Zîq li kewê nerî. Bi rastî jî kew gepek xweş bû. Ava devê rovî herikî.

Kew jî rovî dîtibû. Jê pîrsî, go:

-Rovî, çima tu wilô zîq li min dinerî?

Roviyê fenek go:

-Ma ezê çawa li te nenerim, kewa xweşik? Ew çavê te yên xweşik, ew nerîna ku nava dilê mirrov dihelîne, ew bedewbûna te ya ku hişê kesan ji serê wan dibe... Ma ezê çawa li te nenerim?

Pesindana rovî bi kewê xweş hat. Ket çavê xwe. Xwê qapan kir û xwe nepixand.

Lê derdê rovî ne xweşikbûna wê bû. Derdê wî xapandin û xwarina wê bû. Go:

-Gelo ku tu çavê xwe bigirî jî tu wilô xweşik î?

Kew go:

Ji bo xatirê te ezê çavê xwe bigirim. Ka wişa jî binere bê ez xweşik im ya ne xweşik im.

Kewa bêhiş herdu çavê xwe girt. Hema rovî xwe çeng kiriye û xist devê xwe. Kewa reben fêm kir bê rovî ci anî serê wê. Lê çû bû, qediyâ bû. Bi hêviyek biçûk, go:

-Bi rastî helal be ji te re roviyê biaqil û hunermend.

Te xwarina min heq kir. Lê belê ez xwarina, gepa mîra me, padîşaha me. Berî ku tu min bixwî divê tu şikiriya xwe ji xwedê re bînî.

Rovî go:

-Rast e, gotina te ye.

Rovî ji bo ku şikiriya xwe bîne devê xwe vekir. Kewa girtî, go firr, firr, firya, xelas bû.

Rovî nema zanibû bê wê ci bikira. Di ber xwe de go:

-Nalet lê bê, ê ku hê xwarin ne xwaribe, şikiriya xwe bîne.

Dengê wî çûbû kewê. Kewê jî go:

-Nalet lê bê, ê ku xewa wî ne hatibe, çavê xwe bigire.

H. Deniz

SILÊMANÎ

Bajarekî pirr xweş e û li Başûrê Kurdistanê ye. Li wir li unîversîtan perwerdekirin tev bi zimanê kurdî ye. Tê wê wateyê ku zimanê kurdî li wir li ser hatiye şixulandin û pirr bi pêş ketiye. Navçeya Şarîzor li vir e û xwendî erdeke pirr dewlemend e. Ji awira dîrokî ve jî deve-reke pirr kevn e, ji ber ku li Şanederê di kolan-dinên arkeolojîk de gel-lek navgînên çandiniyê hatine dîtin ku ev nav-


gîn, ji dema ku mirovatî hê nuh dest bi çandiniyê kirine de maye. Dîsa li Hezar Mêrdê li ser dî-warên şikevtan nivîsên pirr kevn hatine dîtin û ev nivîs, ji berî Isa ma-ne. Di navçeya Şarîzor de devera herî bi nav û deng û xweş qeza He-lebçeya şehîd e. Hejma-ra rûniştvanan li wir 150 hezar e. Nehiyeyen ku bi ser Helebçeye ve ne ev in: Biyara, Xurmal, Şa-nîderî, Şeyîd Sadiq. 120 gund jî bi ser bajarê He-lebçeye ve ye. Çiyayen li dora Helebçeye Zincîre, Hewraman, Surêن, Ba-

lanbo in. Bajarê serleskeran vekir da ku Silêmanî ji teref Baba-xortên Kurd têxe nav nan di sala 1784 an de xwe, gel bê xwende û hatiye çêkirin. Ji ber ku rewşenbîr bihêle. Di riya Iran û Ûrûs di vir navbeyna salên 1957-70 ve diçû û navendek dan de li Silêmanî gellek û standiniyê bû. Di beşen enstîtuyan vebûn Bakûrê Silêmaniyê de weke Wêne, seramîk û çiyayê Qeywan, li muzîk û hwd. Herwiha başûrê wê jî çiyayê Gi-lezer heye. Di dema ku bajar ava bû, li wir fab-fika çekan, ya Sabûnê, ya çerm û hwd. jî çêkiribûn. Herwiha di nav bajêr de bi borîyan ava paqîj kişandin. Pirtûkxaneya herî mezin li vir ava kirin. Osmani-yan jî li vir dibistana

uf Yehya û hwd. Li van dibistanan gelek kesen bi nav û deng jî gihîstin, weke; Mehî (1830-şâîr), Zêwer (1875-şâîr), Pîremêrd (ziman, dî-roknas û şâîr-1867), Mele Hemdun (1856-şâîr), Salîm (1865-şâîr), Kurdi (ziman, dî-roknas, şâîr- 1809), Nalî (1797- ziman, şâîr), Mamoste Goran (şâîrek navneteweyî ye- 1905), Dr. Kemal Mezher Eh-med (dîroknas, nivîs-kar).

Bajarê ku bi ser Silêmanî ve ne ev in: Helebçeye, Pêncuwen, Çarta, Mawat, Raniya, Serçinar, Derbendîxan. Li hundirê bajêr 400 he-zar kes dijîn. Tevî der û dora xwe 1 milyon he-ye. Silêmanî û kesen tê de dijîn geleki rewşen-bîr in. Heya dawî serx-webûnxwaz in. Lewma ye ku di Newroza îsal de, ji bo piştgiriya şerê li Bakûrê Kurdistan, gel li wir rabû ser lingan û piştgiriya xwe nîşan dan, rejîma Tirkîye gu-nehkar kirin.

Berhevkinin:
Gabar Ciyan
Zagros Zerdeşti



Nexşeya Kurdistan

Pêkenokên me

Piştî 12 Îlonê gellek kesen polîtîk bûne pena-ber û derketin derveyî welat. Hinek ji wan Kur-dan jî hatine Swêdê. Piştî demekê weke hemû kesî wan jî li dibistana ziman ya seretayî dest bi xwen-dina zimanê swêdî kirin. Li Swêd xerib tev bi hev re diçin dibistanê. 4 Kurd û çend kesen Latîn Ame-rîkayî jî li klasekî (sinif) dest bi xwendina xwe ki-rine û roja pêşî ye (yeke-mîn). Mamoste hatiye klasê û ji wan xerîban xwestiye ku xwe bidin nasandin. Ji serî ve "Navê min Ehmed.. e, ez ji Kurdistana Tirkîye me". Yê 2: "Navê min Zana... ye, ez ji Kurdistana İranê me". Yê 3:

"Navê min Gulbahar... e, ez ji Kurdistana Suriyê me". Yê 4: "Navê min Elî... ye, ez ji Kurdistana İraqê me".

Dor hatibû xortekî din ku ji welatê Şîlî (Latîn Amerika) hatibû Swêd û penaber bû. Wî Kurdistan nas ne dikir, jê re wi-sa hat ku Kurdistan pêwist e were pêşîya we-latê herkesî. Mamoste jê pîrsî:

-Tu dikarî xwe bidî na-sandin?

-Belê, Navê min Ar-mando... ye û ez ji Kurdistana Şîlî me.

Hemû bi hev re ken-iyan. Lê yê ji Şîlî ne dizanî bû ci mesele ye. Pişt re bi demekê, kenê wî bû çar qat.

Mersa lehengiyê

(Mamoste Hejar, 1920 li Mehabadê hate dînyê)

Kurdistan ey niştiman im
Hêzî dil aramî giyan im
Cihê serbilindî û şanazî
Ta dildazê dilxwaz im

Mêşk im hest im bîr im jîn im
Bo tuy giyanî şêrîn im
Gulî pişkewtî bê payîz
Siz nabî û nawerî hêrgiz

Ta zinduwî her tu mabest im
Hoşim dewê te'd perest im
Meşk im hest im bîr im jîn im
Bo tuy ey can i şêrîn im

Ke mirdimleşim be gil bê
Durwêni çend gul û durubê
Gul im bo destî bo dildarit
Çeqlim bo çawî betkarît

Ji hemû mele û feqeyên dilsoz...

Destpêk rûpel 1

Feqiyê Teyran, Ehmedê Xanî, Melayê Cizîri, Mela Mehmûd Bayazidî û gellekên mayîn herkesê me baş nas dike. Şêwirandinê wan cewahirê çanda me ne û bi nivîsarên wan em iro serbilind in. Bi rastî gellek navê nivîsan, hozan û zanayên Kurdan yên hêja hene, ku li nava gel de hêj bi piirayî ne-hatine naskirinê, nivîsarên wan nebûne milkê Kurdân xwendevan. Ew bi destnîsari li cem hinex Kurdân xwedî xîret û zana têne parastinê.

Gellek nimûneyen cewahirê edebiyata me di nav salan de, ji destê tîrsê û zordariyê, ji destê êrîşen xerîban û şipûrên tebîtê an winda bûne, hatine şewitandinê, an ji di binê axê de riziyane û hatine dizînê.

Enstituya Kurdî nêt daniye ber xwe, ku nivîsarên Kurdî yên kevin. bi nivîsa herfîn erebî bicivîne, lê xwedî derê, wan bere-bere bi rengê zanyarî bide çapkirinê. Ji bo pêkanîna vê armancê, li Enstituya Kurdî, ji zanayên Kurdan wê komîyonek taybetî bê bijartinê.

Geli bira!

Hêvî û baweriya min heye, wekî hûn, melle, feqe û rewşenbirê Kurd yên xwedî xîret û xîret piştovanê vê meramê bin û destnîsari...

ROJEVA WELET

Kurdkujî 'pîknîka' Sezgîn

Destpêk rûpel 1

Ev piknik û seyrangeh hedefa dewletê û daxwaza hikûmetê ye ji. Hûr û gir giş partîyen siyasi, iqtîdar û muxalefat hevalbend û piştigirê vê 'pîknîka' ne.

Iqtîdar û muxalefat yek in. Ferga wan tune. Tirkîye welatê bê muxalefat e, muxalefat ji iqtîdar jî zêdetir alligirê iqtîdar ye.

Yekitiyeke xenzîri, mizawir û Kurdujî çêbûye. Nijadperest, liberal, sosyal demokrat û dîndar giş bûne yek. Desten xwe xistine hev û li ber dahola qırkırin û binpêkirina Kurdan govendê digrin û ji aşê şerê Taybetî re bûne şabavvan.

Leşker û sivîlan, iqtîdar û muxalefatê, radyo û televîzyonê, rojname û üniversitan, Kurd raserî çavên xwe kirine. Zik û dilê wan tije xezeb, zikreşî neyarîl ye. Diçin ser gelê Kurd, rojê çend qetîfaman dinik.

Qetîfam yeko yeko, bi dizî heşkere, heft heft, sêzde sêzde, geh li Nisêbînê, geh li Botanê, geh li Amedê, geh li Bedîsê, geh li Bingol û Wanê û carna ji li Istenbol, Edene û İzmîrê têne kirin. Hedefa qetîfaman, Kurd in, karoker û xwendevanê Kurd in.

Méjî û zihniyeta desthilatdarên Tirk yê berê ye. Ji sedsalan û vir de wek xwe ye. Méjî, méjîye qırkırin û kuştînê ye.

Dewletîn Tirk, méjî û seriyê tirkîya resmî gellek xelk û neteweyen Rojhilata Navîn û yên Enedolê hertin û daqurtandin.

Ermenî hertin, Rûmîn Enedolê mengene kirin û Pontûs û Lazêni li dora Derya Reş sitewir û xesandî kirin.

Desthilatdar û militartîstên Tirk çîma gellek kultur û medeniyetan vîmirandin, gellek xelkîn mîna Asûri û Suryaniyan fîcî kirin û iro li şûna wan gund dixwînîn.

Em Kurd mane. Hikûmetê û Daîra Şerî Taybetî ji bo me şes meh zeman danîne. Di şes mehan de gerek koka Kurdan bê qelandin, pişta Kurdan bê şikandin û mîna Ermenî û Pontûsan, Asûri û Suryaniyan eser ji Kurdan jî nemîne. Ji bo vê, karê kî ci ye hatiye diyar kirin. Kurdistan û gelê Kurd ji ordîye, kontr-gerilla û Daîra Şerî Taybetî re ketîye. Karê hikûmetê karê diplomatiyî û têkiliyîn bi derve re ye. Hikûmet û iqtîdar ne di desten Demirel de belê di desten Komîteya Ewlekariya Neteweyî (MGK) de ne. Giş büyer, mudaxele, takîfî û siyaseta paş meha Newrozê vê İspat dinik.

Sezgîn dixwaze Kurdistanê bike kavîl, kevir li ser kevir nehêle û betoneke din bikşîne ser gelê Kurd. Bi vê baweri û bi vê netê dibêje "emê sala bê li ci-yayen Başûrê Rojhilat piknik û seyranê bikin." Sezgîn ji bîra dike ku gelê Kurd ne yê berê ye, şîyar û çavêkîr ye, xwedî partî û xwedî artêş û bûye cebhe.

Belê plan û programê Sezgîn û militartîz û barbariya resmî ev e. Em ji xwedî plan û xwedî program in. Yen me ji.hedefa me ji bo salen li pêş heye. Di van salan de gerek em ji Meclisa Neteweyî damezînîn û gav bi gav Kurdistanê û seranserê. Tirkîye ji bo şovenîz û militartîza Tirk bikin goristan û bingehê birayetiya gelê Kurd û Tirk û giş gelên Rojhilata Navîn saxlem bikin.

Ev çend mehîn havînê mehîn kîrtîk û germ in. Dewlet ci jê bê û ci karibe wê bike. Em ji divê bi nêr û mîyên xwe, bi hûr û mezinîn xwe bibin yek, li dorâ serokayetiya şoreşa welatê xwe bîcîn û bi giş hêja xwe raserî dijmîn bê.

Azadiya bê bedel tune. Azadiya welatê me ji ne bê bedel e. Bedela azadiyê canê qız û xorîn me, gundi û bajariyê welatê me ye. Ev bedel carna mehî gend şehîd û carna ji rojê 30-40 kes in. Azadiya me belki ji ya gellek xelkîn û zêdetir xwegorîkirinê mezîn, disiplin, yekîlî û berxwedaneke mes-tir dixwaze.

Ji bo azadiya xwe hêjaye mirov her tişti bike û qîma xwe bi her nexweşî û dîjwariyê bîne.

Desten xwe bikşînin ji welatê me

Destpêk rûpel 1

sarênu ku ji kal û bavan gihîştiye destê we an ji we bi xwe ji nivîsarên kevin wergirtine, fotokopiyen wan çêkin û ji Enstituyê re bişînîn. Heger çekirina fotokopiyê ji we re giran be, ji Enstituyê re binivîsinin, gelo ci destnîsari li ba we hene, Enstitu wê piştovaniyê li we bike. Ger we xwest destnîsari bi xwe pêşkêsi Enstituyê bikin, ser çava, ser sera. Serokatiya Enstituyê wê bibe minetdarê dilovaniya we.

Geli birayen dîlawer, dengdayîna we li ser vê nama me ya vekevî, gelo ci destnîsarien Kurdî li ba we hene, wisa ji hûnê alîkariya vê komîyonê bikin, ji bo ku lista (navnîşa) destnîsarien Kurdî yên kevin-klasîk bê qisûr bê amade kîrin.

Hînek ronakbîr diben qedera Kur-

dan bi hêja çalak û bi welatê Ewrûpî ve hatiye girêdan, rejîma Sedam wê çiqasî li ser lingan bimîne ev ji ne kîfî e, gelo li hemberî rejîma sedam hêja çalak wê çiqasî din li Kurdistanê bimîne bersîva van pîrsan hê nehatine dayîn. Belê, li gora vê rewse tiştekî rind iro li ber çavan heye: Emperyalistê Amerika ji herêmê û Rojhilata Navîn û dîderketina wi-hesân nîne. Belê iro rastî ev e; mi-

jokdarê Amerika û bi hevalbendê xwe ve li hemberî gelê Rojhilata Navîn û gelê Kurdistan kelemek dijwar e, rakirina vê kelemek dijwar bi yekîti û tifaqiya têkoşîna gelê Kurdistan û gelê Rojhilata Navîn dikare pêk bê. Li ser Hêza Çalak (Çekiç Güç) ditin û ramanen mebûsan

Sedat Yurdaş- Mebûsê Serbixe- we:

Ji bo hêja çalak (çekiç güç) armanca mijokdarê Amerika xwe ji cendermetiya cihanê re bi kar tîne, ev hêz li ser gelê cihanê tevî ji tê xwiya kirin, Amerika û her wekî wan ji bo menfeetên xwe têkoşînê didin, heke xwestin û armanc ne li gora konevanya wan be wê li hemberî derkevin, li gora xwestinê wan bin, wê biparêzin, weke şerî delavê (korfez), weke mudaxela Libyay... Salman Kaya- Mebûsê SHP'ê

Hêza çalak iro ji bo parastina Kurdan e, an bi vî rengî xwiya ye, li pêş wê ci bibe ez nizanim, lewra ez di şikê de me, rewşa Kurdeşîraqê ci ye, wê bibe ci ne kîfî e, çekiç güç li herêmê wê hêza mijokdarê Amerika bide damezirandin, ev li pêş ji bo gelê Rojhilata Navîn wê gellek zerar bide.

Abdullatif Şener- Mebûsê RP'ê Sêwasê:

Em bi prensip li hemberî hêza çalak in, mijokdarê Amerika xwe ji cendermetiya cihanê tevî ji tê xwiya kirin, Amerika û her wekî wan ji bo menfeetên xwe têkoşînê didin, heke xwestin û armanc ne li gora konevanya wan be wê li hemberî derkevin, li gora xwestinê wan bin, wê biparêzin, weke şerî delavê (korfez), weke mudaxela Libyay... Salman Kaya- Mebûsê SHP'ê

Engere:

Ez him li hemberî hêza çalak û him ji li hemberî gerîna awarte (olagan üstü hal) me ezê ji bo vê yekê raya xwe red bavêjim, lewra gelê Rojava çawa tê karbideskirin, gi-ring e ku gelê Rojavayê Başûr (Güneydoğu) ji wisa were karbideskirin.

Li zîndanan grevên..

Destpêk rûpel 1

Li zîndanê Silîva (Farqîn) û Elezîzê, girtî haziriya greva birçibûnê dikin.

Dewlet tade û zîlma li zîndanan roj bi roj zêdetir dike. Girtî ji li hemberî vê zîlme bêdeng namîn û ji her êrîşen dewletê, bi livbaziyên cure cure xwe diparêzin û ji bo mafîn xwe bi dest xin van livbaziyên xwe didomînîn.

Li ser navê girtîyên zîndana Farqîn Cemal Bingol di daxwiyaniya xwe de wiha dibêje: "Ji bo jiyanâ li diji mirovahiyê di zîndanan de bê tekûz kirin, emî dest bi greva birçibûnê bikin." Cemal Bingol wiha didomîne: "Li zîndanê ji bo me û ji bo endamên Hîzbullahê qanûnên cihê cihê tênen ajotin. Ji bo wan her tişt serbest e, lê ji bo me qedexe ye. Em bi malbatên xwe re nikarin bi hîsâni hevûdin bibînîn, lê ew bi saetan li cem hev rûdinîn. Ev ji têkiliyên dewletê û Hîzbullahê eşke-re dike."

Wekî din malbatên girtîyan ji li hember van kirinê dewletê dengê xwe bilind dikin û ew ji wek girtîyan protestoyan li dar dixin.

Li Girtîgeha Elezîzê ji, dewlet li hemberî girtîyan kirinê hovane dimeşîne. Nahêle girtî û malbatên xwe hevûdin bi hîsâni bibînîn, girtîyan dixin huçran û bi vî awayî dixwazin têkiliyên di navbera girtîyan de qut bînîn da ku nikarîbin livbaziyek li dar xin.

Wekelebîn selebîn zîndana Elezîzê ji xitimîne, idare van seleban venake, bêhnekkir girtîyan tehdiyîn. Elezîzê û ev ji sihetâ girtîyan tehdît dike.

Li gor malbatên girtîyan, girtîyên zîndana Farqînê û Elezîzê haziriye xwe ji bo greva birçibûnê didomînîn.

Dicle pir ciddî bigrin. Li Kurdistanê dolivgeriya Tirk zîlma xwe bi hovtîrîn cureyan dike û çekan ji welelaten Ewrûpî û Amerika digire. Tirkîye ketîye rewşekî pirr xirab û ji ber vê yekê bela xwe di gelê hejar dide. Tê wê wateyê ku PKK pirr bi hîz e, lewma ye ku Tirk çekîn heri xirab li hember gerilla bi kar tînîn.

Pêwist e parlamentenê Swêdî vê pîrsê bibine parlamentoya nete-wîyîn din û herwiha yekîtiya millestan. Pêwist e ambargo li ser Tirkîye bête dayîn.

Rejîma Tirkîye! Em piştigirîya hevalen xwe yê Kurd û yên demokrat dikin ku ew ji bo mafîn mirovahîye kar dikin. Desten xwe nedîne wan!

Roger Gross

Hikûmet li ber ci ye?

Destpêk rûpel 1

nîha, koalisyonâ DYP-SHP, di propagandayê xwe de, ji bo bikarîbin ji Kurdan ray bistînîn, digotin, emê vê qanûnê û vê sistemê rakin.

Wê demê Hikmet Çetîn ji wiha digot: "SHP wê vê sistemê raken û wê hertim li pey binçavkirinan û kîrinê polisan be, wê nehîle li herêmê zîlm û zordarî çêbîbe." Li ali din berpirsiyaren DYP ji berya hilbijartîne sozê rakirina Rêveberiya Taybetî didan.

İro herdu partî ji li iktîdarê ne, kîrinê wan ên 7 mehan ji li ber çav in, sistemâ Rêveberiya Taybetî carêkê dirêj kirin û niha haziriya car-

din dirêjkirinê dikin. İro bi devekî din mijûl dibin, dibêjin, MGK (sazgeha ewlekariya neteweyî) ci tewsiye bike, emê bi ya wî bikin. Ev ji es-kere dike ku iqtîdar ne di desten hikûmetê, lê belê di desten MGK, Daîra Serî Taybetî MîT'ê de ye. Jixa we caméra vê inkar ji nakin, lewra heta niha bi tu awayî li diji MGK û saziyên din derneketine, herdem serê wan tewandî û li dûv paşayen xwe meşîyane, dema paşa dibêje hejin ji, şewqa xwe hildidin û diçin!

Ev tişt eşkere ye ku vê Rêveberiya Taybetî carîn bê dirêj kirin, hikûmet di vî karî de ne li ber tiştekî ye û MGK ji, ji zû ve biryara xwe daye.

Karkeren dewletê birçi ne

Destpêk rûpel 1

din dev ji kar berdin ji tu fêde nake. Lewra ji ber ku tu karê Çiftlikan namînîn û çinîn xelas dibe, tu tesîrê li dewletê nake.

DANISTAY, QERARA HIKÛMETE BETAL KIR

Hikûmetê, di 29.5.1992 an de karberdâna karkeren çiftlikên dewletê ku wê 1'ê Hezîranê destpê bikarî, du meha li paş xistibû.

Danîstayê di 17.6.1992 de li ser daxwaznamâ Tarim-İş û querâra xwe da. Daîra hiqûqê a 10. di heqê lipâxistina karberdâne û querâra hikûmetê de wilo querâra: "Querâra ku sendîqa Tarim-İş û daye ku dê 1'ê Hezîranê dest bi karberdâne bikarîna, hikûmetê de ni cih de li paş xistîye. Karberdâna karkeren çiftlikên dewletê, riheşî û ewlebûna welêt xera nake. Ku querâra hikûmetê dom bîkere û karker dev ji kar bermedin, wê gellekî zerarî bibînîn. Ji ber vê yekê ji em querâra hikûmetê betal dikin."

menterê Kurd Xetîp Dicle hatibû Stockholmê. Ew bi xwe yek ji wan kesê parlementerên HEP û ye. Li gozî kehîyên de desten me de, ew tev di bin tehlükâ kuştînê de ne.

Pêwist e hember gerilla bi kar tînîn. Azadiya bê bedel tune. Azadiya welatê me ji ne bê bedel e. Bedela azadiyê canê qız û xorten me, gundi û bajariyê welatê me ye. Ev bedel carna mehî gend şehîd û carna ji rojê 30-40 kes in. Azadiya me belki ji ya gellek xelkîn û zêdetir xwegorîkirinê mezîn, disiplin, yekîlî û berxwedaneke mes-tir dixwaze.

Parlamente Swêdî ku xwe demokrat dibînîn divê vê bêdengîya ku heye ji holê rakin û gel, weşana têxîn kar û xebatê, kanalîzeyî ser vê pîrsê bikin. Pêwist e ew dîtinê Xetîp

Hikûmeta Kurdî li Nexçîwanê

(951-1076)

● Pişî şoresa Rûsyâ, di sala 1923 an de, bi fermana Lenîn, ji bo Kurdên Arranê otonomî hatiya naskirin, payîtexta wê komara Kurd jî Laçîn bû. Belê ji alî Partiya Komonîst a Azerbaycanê ve, di sala 1929 an de ev komara Kurdî hate hildan. Azeriyê Tûrancî û şovenîst, nêzîkî 40.000 Kurd ji cih û warê wan deranîn, li wan zilm û zor kirin, asîmîle kirin û heta îro di nav xwe de helandin, qira wan anîn. Lê Kurdên li nav Ermenî û Gurciyan, ziman û kultura xwe heta niha bi serbestî dijîn, 'dinya bi dor e', 'axê bizina kol ji ya bi sitûreh re namîne.'

NEXÇÎWAN-NAHŞİVAN

Navê herêmekê li navbera çemê Erez û çemê Kûrayê ye, devbidevê ava Erez bi sînorê (tuxûbê) Îranê ve dirêj dibe ku îro li wê derê Komara (cumhûriyeta) Nahşîwanê heye, textûpayê wî bajarê Nexçîwanê ye. Nêzîkî 200.000 nifûsê vê komarê heye. Pirraniya wan Azerî ne, yê din jî Ermenî û Kurdên ku Azeriyê Tûrancî û barbar ew bi zorê asîmîle kirine.

Nexçîwan perçeyek ji 'Arran'ê ye. Arran ew herêma ku dikeve Başûrê Azerbaycan û Qerebaxê ye, Gonçeyê jî di nav xwe de dihêle. Ji hewza çemê Erez û Kûrayê, ber bi Îran û Tewrêz dirêj dibe. Tê gotin ku naveke wî yê din jî 'Başûrê Rojhiliya Kurdistan'ê ye. Di dema Canîşînê (xelîfî) Bexdayê 'Elmutte-qibîllah', di sala '938' an de, di wê herêmê de Hikûmeta Kurdî ya Hezbanî - Deysemî hatîye damezrandin. Di dû wî re, ku Muhammedê Rewadî dibe fermandar, navê wî datîne Rewadî (Rewadî navê qebile-yekî Kurdan e, ku Eyyûbî bavê Selahedinê Eyyûbî jî ji wê qebîlê ji eşîra Hezbanî û ji gundê Dûwînê bûye). Di sala '951' (Mîladi) de, Muhammedê kurê Şeddadê Karto, li Arranê hikûmeta Kurdî ya 'Kûren Şeddadî' ava dike. Heta sala 1076 (m) an, nêzîkî 125 salan di domîne. Textûpayê wan Nexşîwan, Gence, Tiflis û Anî (Xerabeyê Anî li navbera sînorê Qers û Ermenîstanê de ye, bajarekî pirr mezin bûye) ji bajarê wî yê mezin bûne, di hinek deman de sînorê Dewleta Şeddadiyan heta Meletê jî çûye.

Di sala (970 m) an de Ebûhesen, bavê xwe Muhammed ji textê tîne xwar û

xwe fermandar ûlan dike. Di pey wî re jî birayê wî yê Merzûban tê ser text. Di rojeke gest û nêçîrê de, Fezîl'ê birayê

Merzûban birayê xwe dikuje, li cihê wî rudi-ne. Xelk pirr jê hez dikin û bi edaleta wî dilxwes dîbin. Fezîl 47 salan li ser text di mîne, gellek tiştîn qenc û baş jî li welatê xwe dike; li ser pira Erez jî pireke mezin çêdike (ku îro Silêman Demirel û Erdal İnonî di govenda vekirina wê pirê de ne). Di sala (1071 m) an de dimire. Di dû Fezîl re, kurê wî Ebûlsetîn

Hesen (1071-1034), Ebûl Hesen Noşîrewan û Ebûl Es-war Bin Fe-zîl li pey hev li ser text rûdinê. Di pey mirina Alî

Noşîrewan

re, Menûcer Keysultan di sala (1076 m) an de tê ser text. Di navbera Şeddadî, Bîzansî û Selçokîyan de pirr ceng û şer çê bûne. Melîk Şahê Selçokî, di sala (1075 m) de êrif dibe welatê wan, gellek cihan jî işxal dike, belê dîsa jî heta sedsala donzda (esra 12) Anî, Gen-

ce û Tîflîs di destê malbata Şeddadî de dimîne. Di sala (1124 m) an de Gurcî jî di kevin Aniyê, lê di sala (1165-1174 m) an de Anî dîsa dikeve bin hukmê Kurdan. Ansîklopediya İslâmî, di beşa (cuzya) 68 rûpela 1094 an di behsa Kurdan de wiha dinivîsîne: "Çok Münevver olan Şeddadiler dikate değer abideler bırakmışlar. Bu sülale bilahere, büyük Eyyubi sülalesini çi-

hanê, li ser vî qasî bûne yek, ku Selahedînê Eyyûbî Kurd e. Bavê wî û malbata wî ji Dûwînê ne, Dûwîn jî gundekî Arranê ye, xelkê wî jî hemû Kurd in, ji qebîla Rewadî, eşîra Hezbanî ne."

Ansîklopediya "El munid û Fil edebî wel Ülüm" jî, di cîldê duyemîn di rûpela 186 an de wiha dibêje: "Şeddadî MalbatEki Kurdî ye, ji sala (951 m) an heta sala (1076 m) an, di bakûrê Îranê de Fermandarî kirine, 14 melîk (fermandar) ji wan rabûne, yê ewil Mûhemmedê kurê Şeddad bûye, yê dawî jî Key Sultân bûye."

Di dema ku ev hikûmeta Kurdî ya mu-newer, li Bakûra Rojhiliya Kurdistan Fermandar bûye, hikûmeta

Merwanî ya Kurdî jî, li Hesenkêf, Amed û Meyafarqînê hikûmran bûne. Tixûbê wan jî, ji Reha û ji Sûriye he-ta Bakûra Rojhiliya derya-ça (gola) Wanê bûye, Xelat, Melaz-gir û Erdîş jî di binê hukmê wan de bûye.

Baz (Bad)ê Kurd, li Hesenkêf hîmê wê hikûmetê daniye, li dû wî, kurê xwişka Ebu Eli

Ehmed kurê Merwan, kurê Dostik, bi jina xalê xwe yê

Baz re zewiciye. Textûpayê xwe aniye Meyafarqînê. Ji sala (990 m) an, heta sala (1096 m) an fermandarî kiri-ne.

Romen Diyojenê Bîzan-sî, di sala (1071 m) de dix-waze êrif bibe ser xelîfî Bexdayê. Xelîfî Bexdayê bangî Selçokî û Merwani-

yan dike, ku bi hev re li hember Bîzansiyâ derkevin. Bi alîkariya Merwanî û Selçokîyan li Melazgirê Romen Diyojen dîl digirin. Belê sed mixabin, dîrokni-vîskarên Tirkan ên 'Tûrancî' vê rastiyê nanivîsînin û behsa Dewleta Merwaniya Kurdî û alîkariya wan ji Selçokîyan re nakin, dibêjin Selçokîyan bi tenê Romen Diyojen dîl girtine û Melazgirê jî fetih kirine û vê derewê jî ji xwe re dikin şahnaziyekî dîrokî. Belê xem nîne, dinya hemû bi vir û derewên wan dizane, Quran jî di ayetek xwe de dibêje; "Lanet li ser virekan be."

KURDISTANA SOR

Bi munasebata vê behsê, em dixwazin bi xwendevanê delal û hêja bidin za-nîn, ku piştî şoresa Rûsyâ, di sala 1923 an de, bi fermana Lenîn, ji bo Kurdên Arranê otonomî hatiya naskirin, payîtexta wê komara Kurd jî Laçîn bû. Belê ji alî Partiya Komonîst a Azerbaycanê ve, di sala 1929 an de ev komara Kurdî hate hildan. Azeriyê Tûrancî û şovenîst, nêzîkî 40.000 Kurd ji cih û warê wan deranîn, li wan zilm û zor kirin, asîmîle kirin û heta îro di nav xwe de helandin, qira wan anîn. Lê Kurdên li nav Ermenî û Gurciyan, ziman û kultura xwe heta niha bi serbestî dijîn, 'dinya bi dor e', 'axê bizina kol ji ya bi sitûreh re namîne.'


Emrê Ermeniyan dirêj be ku pozê van Azeriyê barbar rind şikêndin. Gotina pêşîyan e, dibê: "Neyne serê kesan, tê serê pisê pisan." Yanî bi tu kesî re xerabî neke, neyê serê te tê serê nebiyên te.

Çavkanî:
1- Islam Ansiklopedisi: Bes: 68, Rûpel: 1095.
2- Meydan Laurus: Cild: 7, Rûpel: 739

3- Elmencîd û Fil Edebî wel Ülüm: Cild: 2, Rûpel: 286
4- Ennicûm-izahire Filmîlûkî wel Qahîre: Cild: 5, Rûpel: 21
5- Elkamil: Cild: 8, Rûpel: 192

6- Tarîh û Kurdistan (M. Emin Zeki): Rûpel: 68
7- Amedrozun Hususi Tetkiki (J. Rass - 1903): Rûpel: 125- 154
8- Kürtler (Bazil Nikitin)

A. Durre



Pêşîyekî Kurdan

karacak olan Rewadi kabilesine mensuptur."

DEWLETA MERWANI-YAN

Dîrokvanê namîdar Mûhammedê kurê Xelkan jî, di dîrokname xwe de wiha dibêje: "Dîrokvanê cî-